Serxwebûna Kurdistanê û helwêsta Barzanî

ROJNAMEGER Mihemed Sanri, di vê gotara xwe de destnîşanî bi rola Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ya di proseya serbixwebûna Herêma Kurdistanê kiriye.

RÛPEL 03

Xebata herdu demokratan dê frawantir be

SEKRETERÊ nû yê HDKê Mistefa Mewlûdî ji Basê re axivî. Mewlûdî aşkere dike ku ew rijd in liser parastina mafên kurdan. Xebatên wan dê li rojhilatê Kurdistanê berdewam bikin.

RÛPEL 04

Esnafên Amedê bo referandumê çi dibêjin?

ESNAF û hemwelatîyên Amedê amadekarîyên referandûmê ji nêz ve dişopînin. Xelkê Amedê aşkere dikin ku eger, di peşnimaya nû de mafên kurdan hatibana parastin wan dê bigota "erê."

RÛPEL 05

bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ

HEJMAR: 07 13-19 SIBAT 2017

www.basnews.com

QEYRANA SÛRÎYE R6

Şerê Reqqayê giran e

Şerê navxweyî yê Sûrîyê berdewam dike. Ligor zanyarîyên xwecihî, HSD heta 8 km nêzî Reqqayê bûye û pevçûnên dijwar di navbera HSDê û DAIŞê de rû didin. Herwiha xelkê medenî ji herêmên şer koç dikin.

REŞNÎVÎSEK BO SÎNEMAYÊ R9

Derfet û astengîyên sînemayê

Salih Soleymanî, di vê gotara xwe de behsa astengî û derfetên li pêş sînemagerên kurd dike. Soleymanî aşkere dike ku ji derfetan zêdetir astengî li pêş sînemagerên kurdan e.

ZAFTEWIRÎYA SÎYASETÊ VAKURÎ R11

Partîyê Sîyasî yê Kurdîstanê Vakurî

Faydeyê zaftewirîye, zafrenginîye û zaf-(kirîye esto la tekanetîye ra tu faydeyo musbet nêameyo dîyene. Ma kurdî zî sey her miletî ganî wayîrê cîya-cîya rêxistinanê sîyasî-yan bibê.

WASHINGTON HATE SER XET!

AMERÎKA ZEXTAN LI PKKÊ -PYDÊ DIKE

> WASHINGTONÊ PKK -PYD HIŞYAR KIR

Hevpeymanîya Îran – PKK û PYDê ya li herêmê bûye cîyê nerazîbûna Washington – Hewlêrê. Ligor zanyarîyên Basê bidestxistî, DYAyê hişyarî daye PKK û PYDê û jê daxwaz kiriye dev ji ajandayên Îranê berdin û hêzên xwe ji Şengalê derxin.

> PKK NAXWAZE PYDÊ JÊ DÛR BIKEVE

Li alîyê din Amerîka hişyarî daye Hevserokê PYDê Salih Muslim ku dev ji sîyaseta PKKê berdin û Amerîka dê destûrê nede ew li Sûrîye û Rojavayê sîyaseta PKKê peyrew bikin. Herwiha PKK jî nerazîye ku PYD-YPG xwe dûrî sîyaseta wan bixin.

> HÊZA ÊZDÎXANÊ DIKE NAV PÊŞMERGE

Hêza leşkerî ya Êzdîxanê ku Heyder Şeşo, serperiştîya wê dikir, diçe bin femandarîya leşkerî ya Wezareta Pêşmerge. Şeşo eşkere dike ku ew li benda fermana Barzanî ne. Ev, nîşaneya zexta Amerîka liser PYDê dihête destnîşan kirin.

> XELKÊ ŞENGALÊ JI PKKÊ DÛR DIKEVIN

Çavkanîyên xwecîyî û fermandarên pêşmergeyên Şengalê eşkere dikin ku xelkê Şengalê rûyê PKKê yê rastîn dîtine û ji refên PKKê vediqetin. Herwiha roj bi roj bo xelkê Şengalê rohn bûye ku PKK ne jibo parastina wan belkû jibo ajandayeka taybet li Şengalê ye.

MUSA KAVAL >02

Paşeroja Şengalê

MURAD CIWAN >03

Însan însanan çawa diparêze?!

EKREM ÖNEN >05

Şiûra neteweyî li bakur çima lawaz e?

MUSA KAVAL

Paşeroja Şengalê

Nakokîyên ku evro liser paşeroja Şengalê destpêkirîne, dikarin bibin pirsgirêkek sîyasî ya metirsîdar di navbera partî û hêzên kurdî de. Eger ew zû bi aqlêselîm nehête çareserkirin dibîte arêşeyek mazin di navbera du partîyên sîyasî yên sereke yên urd de: PKK û PDK.

Lê encamên metirsîdar dikarin gelek ji vê yekê maztir bin, lewma ew dikarin dubendîyek dijwar di nav hêzên sîyasîyên kurdistanî û gelê kurd de jî derxînin. Di vê rewşê de,ev pirsgirêk dikarît derfetî bidete hind dewletên herêmê jî ku vê arêşeyê aloztir bikin, di dawîyê de ev arêşeya navmala kurdan, dikarît gewdeyek nû bigirît û bibîte arêşeyek berfirehtir, bi awayek wesan ku hin dewletên herêmê bo xwe bikin pirsek stratejî û sîyasî. Wê gavê metirsîyek peyda dibît ku kîlîla çarserîyê ji destê PKK û PDK derkevît û bikevîte destê dewletên herêmê.

Belê, eger ev herdu partî, zû liser çareserîyek qebûlkirî, li hev ne kin qemî sê dewletên hêrêmî xwe tevlî pirsa Şengalê bikin. Di vê rewşê de, her yek dê hewl bidet helwêsta kurdan lawaz biket û ji vê yekê mifayan bibînît.

Bawer dikim ku pêwîst e her niho herdu terefên yên navbûrî, çareyek acil û berdewam bo pirsa Şengalê bibîn. Her wesan bawer dikim ku pir fere ku ev çare berî azadkirina Mûsilê bêhête ditin. Lewma, dewletên ku bixazîn pirsa Şengalê bo berjewendîyên xwe bikarbînîn vê gavê bi azadkirina Mûsilê ve mijûl in. Lê piştî ku ev kare temam bibit ew dê hingê pir desttêwerdanê di vê pirsê de bikin û dê nakûkî dijwartir bibin û rewşek sîyasî ya wesan bête pêş ku kurd nikarin bibin akterên çareserîyê.

Dîyare ku Îranê projekî taybet bo Şengalê heye, jiber vê yekê ew dê hewl bidet ku vê herêmê bixe di nav çarcova projê ceosîyasi û ceositratejîya xwe, lewma ev proje we diket ku bi şêwazek ceosîyasî Îranê, Îraqê û Sûrîyê pêkve bêne girêdayîn. Bêguman Tirkîye jî bê deng namînît, ew jî dê hewl bidet ku ev proje binecih nebît, da ne bîte sebebê xurtbûn û zalbûna dewleta Îranê li ser Rojhelata Navîn.Dewletên giravê, herwesan sûnîyên Îraqê jî bi vê yekê razî nabin.

Hêzêt kurd, di van tewazûnên nû de, dikarin bibin terefê lawaz. Herdû terefên kurd PDK û PKK bi taybetî û bi geştî gelê Kurdistanê dê zerermend bibît. Metirsî, dikarin liser kurdan mazintir û dijwartir bibin. Ji ber vê yekê pir fere ku Şengal ne bîte sebê arêşeyek din di navbera kurdan de.

Çareserkirina vê pirsê dikarît û lazime bi dînamîkek hundurî bête ditin, ne bi desttêwerdana terefên bîyanî. Lê gelo ev çareserî dikarît bi çi şêwazî bête dîtin?

Di destpêkê de, lazim e ku her kes hestdarbît bo kurdên êzdî yên Şengalê û bo hemo xelkê vê deverê. Zulim, zordarî, cenosayid, kolekirin, firotin û tadayîyên liser can, mal û namûsa kurdên êzdî wucdana mirovatîyê birîndar kirin, lê nexweşî, êş û janên wan mazintirin ji tesewûrê û ji xîyalê jî. Pêwist e ku li ser van êş û janêt wan hind derd û kulên din jî ne hêne zêdekirin. Jibo vê yekê ya durust ewe ku daxwaz û îradaya xelkê Şengalê bête rumet girtin, qebûl kirin û binecih kirin.

Ji alîyek din ve, rastîyek heye ku Şengal liser parçeyê Kurdistana başûre û berî ku DAIŞ wê dagirît, girêdayî bû bi herêma Kurdistanê ve.

Eger ev herdu prensîp bibin bingeh hingî çû sebebên arêşeyan na mînin. Bi kurtî daxwaza xelkê Şengalê dê bibîte bingeha çareserîyê.

Eger her du terefên kurd PKK û PDK li hev bikin ku Şengal bibîte parêzgehek, hingê daxwaz û hestên xelkê Şengalê dê bêne rumet girtin û qebul kirin. Lê çênabît û ne di berjewendîyên êzdîyan de ye, ne jî di berjewendîyên kurdan daye ku ew ji Kurdistanê bête veqetandin. Pêwîst e ku mekanîzmek qanûnî bête danandin gora wê di vê parêzgehê de, hilbijartinên bi zelalî, azad û bê hîle bêne kirin, her partîyek sîyasî çi PDK, çi partyek ser bi PKK û her partîyek din, bikarin bi azadî proje û pêşnîyarên xwe bo pêşveçon û çareserkirina pirsgirêkên aborî û civakî, pêşkêşî raya gištî ya xelkê Şengalê bikin da ku bikarît bi azadî nunerên xwe bo meclsa parêzgehê dîyar biket û di encamê de bo xwe walîyek bi dilê xwe hilbijêrît.

Ev yeke bi hêsanî rê li ber nakûkîyan û tundrewîya sîyasî digirtî . Bi çi şêwazan nabît ku hêzên kurd şerê hev bikin. Fere ku gotina rêzdar Mesûd Barzanî " xûna kurdan bi kurdan heram e" bibîte bilindtirîn prensip û nirxa sîyasî. Her terefek kurd, her hêzek û her partîyek pê pabendit.

Şengal – Rojava

Amerîka zextan li PKKê – PYDê dike

DESTÊWERDANÊN PKKê li Herêma Kurdistanê, hevpeymanîya Qendîl û Tehranê, derneketina PKKê ji Şengalê, kirdarên PYDê yên dijî ENKSê û bûye cîyê nerazîbûna Herêma Kurdistanê û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê.

Çavkanîyeka haydar ku nexwast navê wî bihête eşkere kirin ji heftenameya Basê re ragihand, Amerîka zextên xwe liser PKK zêde kirîye û hişdarî daye Qendîlê ta ku sinorekî jibo destêwerdan di karûbarên Herêma Kurdistana Rojava de dayne û ajendayên Îranê cîb cî neke.

Ligor wê çavkanîyê dîyar kirîye, Qonsolosxaneya Amrîka li Hewlêrê ku ev demek e serperştîya doza dûrxistina Hêzên PKKê dike li Şengalê, karîye PKK neçar bike ji Şengalê derkevin.

Ligor heman çavkanîyê, Ken Groos Serqonsolê Amerîka li Hewlêrê ku bixwe roja 11ê Kanûna 2016 serdana Şengal û Sinûnê û Çîyayê Şengalê kiribû, gehîştîye encamek giring liser yekalîkirina doza dûrxistina PKK li Şengalê.

Ligor wê çavkanîyê, dawîn guhertin di wê mijarê de, biryara Serokê Hêrêma Kurdistanê ye ji bo rêkxistina Hêzên Heyder Şeşo di çarçoveya Hêzên Wezareta Pêşmergeyên Herema Kurdistanê de.

Heman çavkanîyê daye xûya kirin, wê biryara Serokê Hêrêma Kurdistanê Qendîl şoke kirîye. Her çiqas ku PKK du hêz bi navê YPŞ û YPJ li Şengalê çê kirîye jî, lê di rastîyê de hesabê wê liser Hêza Heyder Şeşo bû ku wekî mezintirîn hêza derveyî Wezareta Pêşmergên Kurdistanê tê danan di wê herêmê de û berê di rêya peywendîyên xwe bi Bexdadê re, PKK hewl dabû Bexdad bi fermî danûstendinê pê re bike û bûdce û pêdîyên wan yên serbazî dabîn bike.

Ew çavkanî dibêje, hesaba sîyasî ya PKK li Şengalê liser Heyder Şeşo û hêza wî bû, ku navbirî çend caran serdana Qendîlê kiribû û bi Cemîl Bayik re civîyabû, lê bi guhertina helwêsta Heyder Şeşo û nêzîbûna wî bi PDK re û biryara Serokê Hêrêma Kurdistanê jibo rêkxistina wê hêzê di çarçoveya Wezareta Pêşemrge de,PKK wusa dizane zîyaneka mezin lê ketîye, jiber ku piranîya endamên wê hêzê xelkê wê heremê ye û bandorîya wan liser sînordarkirina statûya PKK de heye. Lewra jî ew çavkanî dibêje, PKK wê yekê bi derbeyek mezin temaşe dike liser xwe.

Li gor wê çavkanîyê, Ken Groos ku roja yekşemê 11.12. 2016an serdana Şengalê kiribû nexwstûbû hevdîtinê bi Heyder Şeşo re bike û peyamek ji wî re şandibû ku eger ew hêz di çarçoveya Hêzên Wezareta Pêşmergeyên herêmê de neyê rêkxistin kirin, bi tu awayî mamile pê re naken û wekî beşek wê pirsgirêk dihête temaşe kirin ku PKK di Şengalê de çê kirîye.

Çavkanî dibeje; ew helwêsta PYD ku dixwaze êdî bi awayekê pragmatîk sîyasetê bike bi karvedan û bertekên PKK re rû bi rû maye û hêj Qendîlê ew mijar qebûl nekirîye.

Êzdîyên tevlî PKKê bûne jê vediqetin

Li alîyê din, fermandarê pêşmerge li enîya Şengalê Hekar Muhsin radigihîne, xelk êdî dest ji PKKê berdidin, jiber ku rûyê wan ê rastîn ji her kesî re eşkere bûye.

Emîd Hekar Mûhsin ji malpera fermî ya PDKê re gotîye, xelk berdewam ji refên PKKê vediqetin; ligorî yasaya PKK her kesek dest ji wan berdide, jîyana wî dikeve metirsîyê, lê dîsa jî ew kesên ku ji wan vediqetin pûte bi wê metirsîyê nadin, jiber ku rastîya PKKê ji wan re eşkere bûye.

Fermandarê pêşmerge herwiha gotîye, ew hêceta ku PKK dibêje; ew jibo parastina xelkê Şengalê mane qet ne rast e, jiber ku ew tenê li Şengalê mane ku astengîyan li pêşîya avedankirina Şengalê derxînin. Hêzek bi navê Şengalê avakirine û jibo armanc û meramên xwe wê hêzê bikar tînin, ku bi vî awayî xelkê Şengalê dikevin metirsîyê de.

Fermandarê Pêşmerge li enîya Şingalê Hekar Muhsin daye zanîn ku Pêşmerge Şengalê diparêzin, lewma pêwîst nake ku PKK li vê navçeyê bimîne.

AMERÎKAYÊ PYD HIŞYAR KIRÎYE

LİGOR wê çavkanîyê, di çarçoveya hewlên PYD jibo rêkxistina peywendîyan bi Amerîkayê re, nûnerê Amerîkayê li Sûrîyê hişdarî daye Hevserokê PYDê Salih Muslim ku peywendîyên xwe bi Qendilê re qut bikin û daxwaz ji navbirî kirîye jibo normalkirina têkilîyên Amerîka bi Rojava re, mercên Amerîka ew e ku PYD bi yek carî ji Qendîl dûr bikeve.

Ligor wê jêderê, mercê Amerîka ji PYD re û danûstandînên sîyasî bi wê re di çarçoveya gotûbêj û çareserîya navxeya Sûrîyê de, ew e ku PYD bi yek carî dest ji PKK berde.

Li gorî wê jêderê, yek ji xalên ku Amerîka wekî hişdarî daye PYD û wekî xala sor bi nav kirîye ew e ku nabe bi ti awayî hêzên Rojava li Sûrîyê şerê artêşa Tirkîyê bikin.

Ew çavkanî dide zanîn, PYD di wê mijarê de nermî nîşan daye û ligor pisporan jî, daxuyanîyên berpirsên Rojava derbarê Tirkîye de hatine guhertin û ew jî jiber wan guvaşên Amerîkayê bûye.

Heman çavkanî dide xûya kirin, niha berpirsên PYD di nav xwe de gotûbêjan liser biryardan jibo daxwaza Amerîkayê dikin ku Fransa û Rûsya jî pêre hevbîr in û beşeka zêde ji berpirsên PYD jî gehîştine wê encamê ku eger peywendîyên xwe bi PKK re qut nekin dê azmûna Rojava rastî karesateka mezin bihêt.

Serxwebûna Kurdistanê û helwêsta Serok Barzanî

MIHEMED SANRI

KURDISTAN di arasteyê navxweyî û navneteweyî de tekoşîneka dijwar ya serxwebûnê dide.

Sê hokarên sereke hene ku serxwebûna Kurdistanê wekî dînamîzmeka dîrokî derdixin pêş. Di werçerxanên weha dîrokî de nêrîn, helwêst û şîyanên serwer û lîderên miletan çarenûssaz in. Ji ber ku prosesên weha ne tenê bi dînamîkên madî û sirûştî belê bi mîmarên xwedan biryar û karîger form û encam digirin. Milet bi îradeya xwe ya sîyasî digihên felatê anjî bi bêîradeyîya xwe bin dikevin, ji meydana dîrokê wenda dibin.

Ya yekê: Helwêsta Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî ku ew di heman demê de Serfermandeyê Giştî yê Peşmerge ye jî, wekî helwêsteka nêpartîzanî ya bo parastin û destvehênana armancên neteweyî û hevgirtî ye. Di vê helwêsta wî de sîyaseta bicîanîna armanca serxwebûna Kurdistanê ne cîyê guftûgoyeka ku ka divê ev armanc bê cî an ne. Helwêsta wî, formgirtineka dî nû ya danêrê mezin yê bîrûbawerîya projeya neteweyî ya miletê kurd Mele Mistafa Barzanî ye ku digot: "an Kurdistan an neman" e. Wate mijara serxwebûna Kurdistanê di bergehê nêrîna lîderê herî karîger yê miletê kurd de ne cîyê guftûgoyê ye, belê armanceka rasyonel ya ku rojane di her arasteyî de kar bo dihêt kirin e.

Mixabin gelek alîyên ku qet hesteka wan ya berpirsîyarîya neteweyî tune, gelek nemesûlane himberî vê helwêsta Serokê Kurdistanê hewl didin, xwe dispêrin nêrînên çewt û bêbingeh; her wekî doza serxwebûna Kurdistanê dozeka takekesî, malbatî ya Mesûd Barzanî anjî ya Partîya wî be, wisa rave û analîz dikin. Gelek eşkere ye ku ev nêrîneka têkçûyî ye, ti peywendîyên vê nêrînê digel hiş û bîra Kurdayetîyê re tune.

Ya duyê: Di navenda herêmêka di dinê de herî têr alozî û qeyran de, Kurdistanê êdî karîye bibe grava îstaqrar û aramîyê; karîye bibe penageha bêpenayan. Di nav du salên dawîyê de, di şerê li dijî DAIŞê de jî gelek eşkere bû ku Kurdistan û Peşmerge bûne pêkhênerên sereke yên ewlehî û parastina asayişa Rojhilata-Navîn û ewlehîya hemî dinyaya medenî jî. DAIŞ dirindetirîn rêxistina terorîst ya dinyaya me ya îro ye. Helbet, hedefa DAIŞê ne tene Iraq û Şam bû. Ger li Kurdistanê têkneçûbûya, Hewlêr jî girtibûya, girtina Şamê û Bexdayê jî, bo wê pir hêsan dibû, dê nefes li hemû dewletên Misilman jî biçkandîya. Hedefa wê ya duyê jî Ewropa û Emerîka bû, ji peravên Emerîkayê jî hedefa wê ew bû ku xwe bavê peravên Hindistan û Asyayê jî. Her niha jî her welateê dinê dikare bibe armanca êrişên vê rêxistina dirinde.

Lewma derbeye kujende ya Peşmerge li DAIŞê dayî bo ewlehîya dinê hemîyê jî serkeftineka mezin bû.

Gelo ma giringîya serxwebûna Kurdistanê tenê bo şerê li dijî Daişê ye? Na. Berê xwe bidin Rojhilata Navîn, Iraq, Sûrîye, Yemen yekcar dewletên têkçûyî ne ku bûne sedemê neseqamgirîya hemî herêmê û agirê şerê tayfegerî vêxistine. Îran modeleka dî ya "dewleta terorê" ye. Endama NATO-yê Tirkîye jî di nav de yek dewlet tenê nîne li herêmê de bûyîbe modeleka seqamgirîyê. Hemû bûne maka teror û makîneya veberhênana neseqamgirîyê bo hemî komalgehên nêvneteweyî jî; şer, bêkarî, feqîrî, koçberî, teror, binpêkirina mafê mirov û azadîyan, xeterdîtina kêmîneyan, vederkirina dîn û bawerîyên cida xetên sereke yên karekterê van dewletan in.

Kurdistan, berovajî van dewletên têkçûyî, di vê navçeya bo mafê mirovan herî xeternak de bûye modeleka nû ya dî ya zindî ya bo parastina hemî buhayên mirovahîyê. Ji alîyê parastina xet û jêderên enerjîyê yên bo dabînkirina pêdawîstîyên dinê jî Kurdistan hem wekî hêza Peşmerge hem jî wekî lokasîyoneka geopolîtîk êdî faktoreka sereke ya seqamgirîyê ye. Derdora wê bûne maka tevdanê, lê Kurdistan êdî mîmar û parêzerê parastina aramîya herêmê ye. Kurdistan bi hêz û Pêşemergeyê xwe ve, parçeyekê ewlehî û asayişa navdeweletî ye. Ji alîyê meydanî ve jî her wisa ye, çewan cîyekê herî giring di nav koalîsyona li dijî şerê DAIŞê de girtîye, her wesa protokola eskerî û sîyasî digel Emerîkayê jî îmze kirîye. Berovajî nêrîna dijminane ya ku heya niha digotin: "ger dewleteka kurdî çêbe dê bibe sedema têkçûna îstiqrara herêmê", bêyî Kurdistaneka serbixwe seqamgirîya herêmê nayê parastin. Hemû "modelên" hene têkçûne.

KURD LI DURÎYANEKÊ NE

Ya sêyê: Helbet ger xelkê Kurdistanê, serwer û pêşîvanên kurdan yên sîyasî dewleta kurdî ya serbixwe ava nekin, kes nahêt bo wan ava nake. Ev proseseka avakirinê ye, ne tişteka jiberxwe çêbe ye. Ger di vê "derfeta dîrokî" ya ku hemî nîzama kevn têkçûyî (wekî têkçûna peymana Sykes-Picot û dewletên têkçûyî) de, kurd wekî miletekê xwedanrûmet dernekeve ser meydana dîrokê, ev fersend dema ji dest çû dê sed saleka dî fersendeka weha bihêt- nehêt ne dîyar e. Yanî kurd liber durîyanekê ne; yan dê jîyaneka koledarîyê berdewam bikin anjî dê wekî hemî miletên medenî biryarê li ser çarenûsa xwe bidin. Lewma Serokê Kurdistanê Mesud Barzanî bi her awayî di ferqa vê fersendê de ye, ew naxwaze careka dî miletê kurd bikeve ber lingan, bikeve ber pêla enfal û kîmyabaranan, derbederî dinê bibe û careka dî bêrûmetî li hemî buhayên vî miletê bihêt kirin. Ji ber vê jî biryara serxwebûnê bo wî biryara man û nemanê ye. Ev biryar li ser hertiştî re ye.

Helbet destên dereke, bereyeka li dijî serxwebûna Kurdistanê di nav komalgeha kurd de jî pêk anîye; wekî taxima Gorran, Komaleya Îslamî û PKK-yê û hwd. Ev bere di her arasteyî de dijayetîya dewleta serbixwe ya Kurdistanê dike. Ev jî, alîyê reş yê dîroka miletê kurd e. Guman nîne dîrok dê vî bereyî bi rûreşî û têkçûyî tomar bike. Kurdistaneka serbixwe êdî mîsoger e, hem mafê kurdan e ku bi sedan sal in jê hatîye standin û hem jî êdî pêwîstîya dinê ye jî.

MURAD CIWAN

Însan însanan çawa diparêze?!

Xwendevanên hêja, goya min ê hefteyekê bi kurdî, yekê bi tirkî binivîsanda, ez cardin bi kurdî derketim pêşberê we. Ev, ne ji min tê. Me bi edîtoriyê re welê li hev kiribû, nuha daxwaz heye ku ez tim bi kurdî binivîsim. Loma…

***

Rakirina biryara Donald Trump ya qedexekirina seyaheta welatiyên hin dewletên misilman a ji bo Amerîkayê ji bal dadwerên wî welatî ve, protestoya welatiyên ji rêzê û hin serokên naskirî, bi daxwiyaniyên 'em hemû misilman in', diviya li Tirkiyeyê ji du aliyan ve deng vedana. Hatibe behskirin jî, di rex re hat vizikîn, giringîya wê fehm nebû.

Di demekê de ku hestên xwedêgiravî Rojava/dinya xiristiyan li hemberê misilmanan çend pêşînhukm û êrîşkar e, tên fûrandin, îdamên temsîlî yên Noel Baba ji alî medyayê û siyasîyan ve di çavan tên rakirin, peyamên tehdîdkar ji bo ew awe jiyanên 'ne li gor' normên serdest, tên rêkirin, rawestandina fermanên serokê xwe ya dadwerên DYA'yê, da misilman bi azadî seyaheta wî welatî bikin û serîrakirina wezîra derva ya berê Madeleine Albrightê (di ser de yeka cuhû ye jî) bi daxwaza 'min jî îdî misilman binivîsin', tezên li ser pevçûna Rojhilat-Rojava/îslam-xiristiyaniyê hejandin.

Li wê Rojavaya (heke em welatên wek Japonyayê û Avusturalyayê jibîr nekin, li wan welatên demokrasiya pêşketî) ku ne homojen e, îslam li rex xiristiyaniyê dînê duyê ye, hemû bawermend û nebawermend ji rengên civatê tên zanîn, ev diyarde ne take-buyer e, ne jî bi warên diyarkirî sînorkirî ye. Heta tevî rewşa konjonkturel a tevgerên nîjadperest ên dilreşkir, ew, pêşveçûneka esasî ye ku mora xwe li dewrana me dide.

Ev meyildariyên berahevdana medeniyetan/olan yên ku berhema îmajên 'rikeberiyeka tevayî' ne, dibe ku wek lênayiyên pêdiviyên dinyaya global, gav bi gav ji qadê dertên, lê li devera me ya ku dergûşa etnîsîte, dîn û kulturên curbicur e, enerjiya me ya diviya berhênê xweşkirina jiyanê buya, diguhêre dike gurrkirê agirê jiyana dojehîn.

Denghildana welatiyên DYA'yê yên ji dînên cuda ya bi slogana 'em hemî misilman in', kêm be jî wek daketina însaniyetê ya meydanê jî hat dîtin. Lê xerîb e, têgihîştin ne wek parastina misilmanan a ji bal cuhûyekî, xiristiyanekî, an ateîstekî, wek ya 'însanekî ji bal însanekî din ve' ye . Ya rast, Trump, ne bi giştî li hember însanan, li hember yên xwedan nasnameyên misilman pêşînhukmî kir. Xwepêşanderan jî bi zanîn, misilmantiya wan li gel ya xwe hevrûmet dît û got 'ez jî misilman im'. Kes ji misilmantiya xwe nehatibû şêlandin. Wan negotibû 'ew însan in, bira bên welatê me.' Bi taybetî gotibûn 'misilmanan piçûk mexin, ew çi bin, bila welê bên. Xristiyaniya min û misilmantiya wan di mafê hebûn û azadiyê de hevast in.'

Meyildariya me ya micerredkirinê, giştîkirinê (ya flûkirinê, da em nebêjin bincilkirinê) ji niyetçaktirînê me bigire heta reqtirîn bêfêhmê me, di civaka me de berbelav e û di hemû tebeqeyan de heye.

Di salên 90'an de, ku Demirel li gel İnönü got 'em realîteya kurd nas dikin', kurdan destpêkir Newrozên xwe, dawet, şîn û şahiyên xwe, rojên xwe yên dînî û adetî bi ziman, kinc, rabûnrûniştinên xwe pîroz kirin, sembolên xwe yên neteweyî hildan. Kolanên kurdan bi stiran û cemûcoşên kurdî olan dan. Nebê, dewletê pêşbîniya diyardeyeka wiha nekiriye ku veciniqî, got, 'Hop, ku me got em realîteya Kurdî nas dikin, me negot cudaxwaziyê bikin!'

Em hergav aliyên xwe yên mişterek derdixin pêş, gava rastî hin reng an tonên piçek cuda tên tirs û xof me digire, em hema wan dimalin bin cilikê. Eger em neşên veşêrin, bi gurmîn mîrkutekî li serî didin. Em, yên kurd, çerkez, ereb, alewî, xiristiyan, êzîdî, jin, zarok, yên ne ji bajar an gundê xwe, li derveyê norman, ecêb dibînin û fişefiş bi me dikeve.

Lê demokrasi, awayekî bihevrejiyanê ye ku însanan qasî aliyên wan ên hevpar, ên cuda jî, di çi mesafe an pîvanê de hebin, bi wî awayî qebûl dike, her cudayiyeka din, di asta hevrumetiya a xwe de dibîne. Rejimên ku mafê jiyanê tenê didin aliyên mişterek, ne demokrasî ne.

Parastina însanan, bi wêdekirin an nedîtina nasnameyên cuda nabe, lê bi dîtin û pêşdeanîna wan dibe. Ev taybetmendî, meziyetek e ku bi toleransa/xweşbînîya semereya perwerdedariyê, bi têgeha me ya tesewifî; gihaştina merheleya kemale tê bidestxistin.

Xweşbînî, ne welê sivik e ku difn lê bê badan. Yên zanist, fîlozof, entelektuelên kartêkir, balê dikêşin serê ku tenê bi perwerdebûna bidestxistina zanistên fenî û însanî-civakî, meriv nabe kesekî/a perwerdedar, nagihê kemalê. Diyartirîn pîvana perwerdedarî û gîhana kemalê, xweşbîniya ku însan karibe hemû aliyên cuda yên însanan, di asta yên xwe de hevrûmet bibîne. Ji xwe parastina însanan ya ji bal însanan jî ev e.

Sekreterê giştî yê Hizba Demokrata Kurdistanê:

Xebata herdu demokratan dê frawantir be

Em bi ciddî hez dikin her du demokrat hev bigirin û bibine yek, jiber ku bi yekgirtina wan potansîyeleka mezin dikeve kayê. Em vê wekî zerûretekê dibin. Em hêvîdar in, alîyê din jî ciddî bin. Hevdîtin jibo hevgirtinê berdewam bûn, lê braderên HDK-Î ev pêvajo rawestandin, jiber ku ji derbirrînên kak Xalid nerazî bûn û dîtinên wan yên cuda liser helwêsta me ya diyalogê hebûn.

MISTEFA Mewlûdî Sekreterê nû yê Hizba Demokrata Kurdistanê (HDK) derbarê guherînên di serkirdeyatîya hizbê, xebatê hizbê li Rojhilatê, pewyendîyên wan ê ligel Hizba Demokrata Kurdistana Îranê (HDKÎ) ji heftenameya Basê re axivî. Mewlûdî destnîşanîyê bi xebata herdû layanên demokrat dike û wisa dibêje: "Xebata me pirrehend e, xebata me ya medenî nav welat heye, xebata pêşmerge heye, ya dîplomasî heye. Di meseleya din de gava ku hêzek parçe dibe, bêguman xebeta her parçeyekê ji haletê yekgirtî yê wê divêt lawaztir be. Xebata herdu demokratan bi hev re bêguman dê hîn frawantir bûya. Wekî din xebata me paralel bi hemî rêxistinên Rojhilatê re, bi taybet bi HDK-Î re ber bi pêş ve diçe."

Sekreterê giştî yê Hizba Demokrata Kurdistanê hate guhertin. Gelo prosedûra vê guhertinê çewan bû. Di haletên asayî de sekreter di kongreyê de dihête guhertin, gelo hûn çima hêvîya kongreyê neman daku sekreter biguherin? Hest bi lezûbezekê di guhertina sekreter de dihête kirin? Gelo guhertina sekreter dê liser siyaseta hizbê tesîrê bike?

Ligor peyrewa navxwe ya hizbê, sekreterê giştî ji alîyê Komîteya Merkezî ya hizbê ve dihête hilbijartin. Ango her civîneka KM ew selahîyet heye, ku sekreterî biguhere û di vir de çi rûdaneka neyasayî nehatîye encam dan. Lê rast e, di gelek haletan de, sekreter di civîna KM ya piştî kongreyê de dihête hilbijartin û heta kongreyeka din liser wî postî dimîne. Loma jibo hindek kesan seyr dihête dîtin, ku sekreterê ne di prosesa yan digel kongreyê hatîye guhertin. Yan na wekî me got her civîneka KM ew selahîyet heye sekreter biguhere û ev pêvajoyeka siruştî ye, lê rast e, wekî urf diyardeyeka degmen e. Herwiha ligor peyrewa navxweyî ya hizbê her kesek du caran heq heye bibe sekreter; kak Xalid Ezîzî du caran wekî sekreter hatibû hilbijartin, ango di hêla yasayî de jî dewra kak Xalidî temam bûbû.

Dihête gotin, ku kak Xalid ji ekoleka nûtir e, û zêdetir pêdagirî digel rêçareyên medenî, bo nimûne danûstandin bi hikûmetê re, dike, lê cenabê te zêdetir meyla xebata çekdarî heye. Gelo tiştekî wisa rast e?

Siyaseta HDK ligor kesan nahête guhertin. Siyaseta HDK di polîtbîro û KM de dihête diyar kirin. Wekî presîp ji zemanê Pêşewa Qazî heta Dr. Qasimlû û Dr. Şerefkendî ticarî me alternatîva gotûbêjê nedanîye alîyekî. Lê pirs liser teknîka gotûbêjê bixwe ye, liser mekanîzma wê ye, liser zemîneya gotûbêjê bixwe ye. Jiber ku Hikûmeta Komara Îslamî ew kapasîte têde nîne ku bi rêka siyasî pirsgirêka kurd çareser bike. Yan na liser alîyetên gotûbêjê bi Komara Îslamî re di van çend salên ku me bi hev re kar kirîye ti ciyawazî di navbera min û kak Xalid de nebûye. Di hêla din de rast e, ku vatiş û edaya sîyasî ya kak Xalid dikare ji ya min ciyawaztir be. Ev jî ji paşxanên cuda û ji fezaya demokratîka hizba me dihêt.

Yanê em dikarin bêjin di peywendî bi rêbaz yan meyla gotûbêjê bi Îranê re ti guhertin di siyaseta hizbê de çê nebûbe?

Nexêr. Jiber ku meseleya kurd meseleyeka sîyasî ye, û divêt bi rêya dîyalogê bihête çareser kirin. Em dîyalogê wekî yek ji rêbazên xebat û têkoşîna hizbê dibînin û ev yek ji rûberên siyaseta me ya resmî ye. Lê teknîka dîyalogê dikare cudatir be. Dibe ku teknîka kak Xalid jibo vê dîyalogê cuda be. Lê herçende ev kar tenê karê min nîne. Karê KM ye. Heger KM li cî dît ku dest bi dîyalogê bike, ligor helûmercan dê teknîkeka qabilî îstifade jibo dîyalogê bi kar bihîne.

Ew di hêla siyasî de bû, lê gelo di hêla rêveberîyê de piştî hilbijartina cenabê we ti guhertin dê bihête holê. Ango modeleka serkirdayetî yan birêveberayetî ya ciyawaz dihête peyrew kirin.

Yekem ev e, ku ev deh roj in, ez hatime hilbijartin, paşan hindek prensîp û siyasetên sabit ên hizbê hene, ku ne kak Xalid dikare biguhere ne ez. Lê helwêstên hizbê jî ne dogma mutleq e. Guhertinên herêmî tesîrê liser hizbê dike.

Xebatên hizbê di çi astekê de ye. Xebatê rêxistinî û astê tevlêbûna çawan e? Piştî cudabûna ji HDK-Î gelo astê xebata we xurttir bûye yan lawaztir? Gelo xebateka we ya koordîne bi HDK-Î re heye, yan gelo frîksiyon di navbera we de çê dibe. Bo nimûne HDK-Î helmeta Rasanê ragihandin, helwêsta we lember wê helmetê çi ye? Wekî me bihîstîye hûn ji van helmeta wan nerazî ne. Çima? We boçûna xwe jibo wan dîyar kiriye?

Xebata me pirrehend e, xebata me ya medenî nav welat heye, xebata pêşmerge heye, ya dîplomasî heye. Di meseleya din de gava ku hêzek parçe dibe, bêguman xebeta her parçeyekê ji haletê yekgirtî yê wê divêt lawaztir be. Xebata herdu demokratan bi hev re bêguman dê hîn frawantir bûya. Wekî din xebata me paralel bi hemî rêxistinên Rojhilatê re, bi taybet bi HDK-Î re ber bi pêş ve diçe. Liser wê helmeta ku wan dest pê kirîye, me piştgîrîya xwe ragihandîye û me xemxurîya xwe jibo pêşmergeyên wan yên canbext jî diyar kiriye. Lê ev deh sal in, me xebateka wisa daye dest pê kirin û bi qandî hejmara şehîdên ku wan di mawê van du salan de daye, me jî şehîd dane. Me her îsal du şehîd û çend birîndar jî dane. Lê dibe ku dîtinên me yên ciyawaz liser teknîka Rasan wan hebin. Dibe ku bi bawerîya me di teknîka Rasan wan de kêmasî hebe. Wan jî liser çewantîya teknîka xebata me ya medenî û çalakvanên me yên xebata nav bajaran de têbînî hene. Rêz û hurmeta me bo helmeta Rasana HDK-Î heye, lê me têbînîyek heye, gelo bi qasî ku wan qurbanî dane, destkeft jî bi dest ve anîne? Gelo etûdeka baş liser vê helmetê hatîye kirin. Peywendîyên me bi wan re ne di astekê de ye, ku em pêkve rûnên û liser encamên helmetê etûda xesarnasîyê bikin. Di medyayê de jiber xwîna şehîdên demokrat me nexwastîye em rexneyên xwe derbibirrin.

Herçî hejmara endam û pêşmergeyan e, ez nikarim hejmaran dîyar bikim, dikarin bêjim di hêla çendîtîyê de em û hevalên din yên demokrat teqrîben di heman astê de ne. Lê tişte heye, ew jî berê gava ku me dewreyên perwerdeya pêşmergeyan çê bikira belkî hejmara her dewreyekê 100 bûya, niha 200 e. Ev guhertin hem liba me hem liba hevalên din dihête dîtin. Medyaya ku ew bi kar dihînin belkî zêdetir înternetî be, ya me televîzyoneka mutewazi heye.

Bi hatina Trump re hûn pêşbînî dikin çi guhertinên bineretî li Rojhilata Navîn, nemaze li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê çê bibe? Ew derfetên guhertinê ku Trump biafrîne dikare çi tesîrekê liser peywendîyên we û demokrata din bike, ango rêxweşker e, jibo hevgirtinê?

Bi bawerîya me, DYAyê siyaseteka sabit di pênava berjewendîyên neteweyî yên xwe de hene. Dikare hindek arasteyên vê siyasetê bihêne revîze kirin, lê bi giştî siyaseta wan ligor şexsekî rastî guhertinên radîkal nahêt. Rast e, hem Trump hem jî kesên ku jibo rêveberîya xwe întisab kirîne, liser Îranê vatişên tund kirine. Behsa zextên rejîma Îranê û destêwerdana wê li derveyî Îranê dikin; ev nîşan dide ku renge fişarê bihînin ser Îranê. Ev zext û fişara dikare derfetekê jibo tevgerên Rojhilatê Kurdistanê pêk bihîne ku bikaribin hindek xebatên xwe bi pêş de bibin. Di haleteka wisa de jibo ku em bikaribin bi awayekê xebatê bikin, divêt em yek bigirin. Divêt em keresteyên siyasî biafrînin, ku bikarin ji vê firsendê kelk wergirîn. Keresteyekê pir baş ku em bikarin ji vê derfetê sûdê bibînin, yekgirtin demokratên Rojhilatê Kurdistanê ye.

Xelk bi giştî liser wê bawerîyê ne, ku her du hizbên demokrat rakid û li cîyê xwe rawestîyayî ne, passîv in, xebatê nakin. Xuya ye hêvîyên wan ji demokratan hene. Hûn liser vê çi dibêjin?

Yên ku di wê bawerîyê de demokrat passîv in û tiştekî nakin, neheqîyê dikin û ji xebata me ne agehdar in. Ya dûyê, em tevgerên Rojhilatê Kurdistanê ne û ji lewre bivê-nevê tabiê rewşa sîyasî ya Îranê ne. Heger rewşa sîyasî li Tehranê biguhere li Kurdistanê jî dikare biguhere. Di serdema Komara Mehabadê jî jiber ku rewşa giştî ya Îranê hate guhert, lewre ew komara hate damezrandin. Li başûrê Kurdistanê jî herwiha, heta guhertinên bineretî bi ser Iraqê de çê nebûn, ev kîyana ku li başûr di bin sîwana Hikûmeta Herêma Kurdistanê de çê bûye jî dê çê nebûya. Li Rojavayê Kurdistanê jî her wisa ye. Li wir niha xweserî, kanton û federalî çê bûye. Em rewşê li Rojhilatê dişopînin. Em dê di ayindeyê de jî bibîne aktorekê serekî li Rojhilatê.

Peywendîyên we bi rêxistin û partîyên din ê rojhilatî re çawan e? Mebesta min xebata di nav Rojhilatê Kurdistanê de ye.

Peywendîyên me bi hemîyan re pir baş e. Piştî komkujîya Şeva Yelda yê, ku çend pêşmergeyên me şehîd ketin, 30 partî û rêxistinên sîyasî yên Kurdistanî tevî yên Rojhilatê piştîvanîya xwe jibo hizba me îlan kirin û di akama vê yekê de me tevî şeş partî û rêxistinên rojhilatî kommîsyoneka emnîyetî jibo ewlehîya baregehên partîyên rojhilatî li başûr damezrand. Ji niha ve dîyalogeka me heye, em xebateka hevbeş li Rojhilatê bidine dest pê kirin. Vê prosesê dest pê kirîye û dê berdewam be. Lê heger hindek hizb xwe yên eslî û navendî nebînin, ev proses dê bigihîje armancekê. Lê di hêla pratîk de em hindekî hêdî tev digerin. Em ligor zerûreta rewşê bi taw û sureta pêwîst hereket nakin. Yek ji sedeman jî ev e, ku di hindek waran de HDK-Î liser wê bawerîyê ku nabe em di xebatên wisa de beşdar bin. Di nav çend komeleyan de jî ev pirsgirêk hene. Niha amadeyîya hevkarîyê zêdetir e. Lê zerûret wisa ye, divêt em xêratir hereket bikin.

EM DIXWAZIN DEMOKRAT HEV BIGIRIN

Demeka dirêj e, hewl û munaqeşe liser hevgirtina her du hizbên demokrat heye. Gelo ji aliyê we ve, hûn bi ciddî hez dikin ev hevgirtin çê be, yan fişara xelkê we mecbûrî vî karî dike? Piştî hatina cenabê te gelo dê hewleka ciddî bo hevgirtinê dest pê bike?

Em bi ciddî hez dikin her du demokrat hev bigirin û bibine yek, jiber ku bi yekgirtina wan potansîyeleka mezin dikeve kayê. Em vê wekî zerûretekê dibin. Em hêvîdar in, alîyê din jî ciddî bin. Hevdîtin jibo hevgirtinê berdewam bûn, lê braderên HDK-Î ev pêvajo rawestandin, jiber ku ji derbirrînên kak Xalid nerazî bûn û dîtinên wan yên cuda liser helwêsta me ya diyalogê hebûn. Lê bi bawerîya me divêt Rojhilatî kêşeya xwe her bi dîyalogê bi Îranê re çareser bikin, çewan ku başûrî bi Iraqê û bakurî divêt bi Tirkiyê re liser masê muzakerê çareser bikin. Ji roja ku ez wekî sekreter hatime hilbijartin, min îlan kirîye werin em bi awayekê ciddî û sadiqane liser hevgirtin bi hev re bikevin dîyalogê. Ne jibo dilê xelkê û xwe xweş bikin, lê jibo hevgirtin û yekgirtinê vê dîalogê bidine destpê kirin. Ez bixwe ji vê rewşê nerazî me. Ev derbeyeka mezin li demokratan dixe. Tevgera kurd li Rojhilatê lawaz dike. Wekî presîp em dîaloga hevgirtinê wekî zerûretekê pênase dikin. Lê bi destekî çepik nahêt lêxistin, divêt alîyê din jî pêşde bihêt.

Esnafên Amedê:

Bila destûr mafê kurdan biparêze

NÛJÎN ONEN

AKP - MHP dest bi amadekarîyên bangeşeya referandumê kirin. Dihête çaverê kirin ew bangeşeyeka hevpar amade bikin û daxwazê ji xelkê bikin ku di referandumê de bêjin "erê." Herwiha dê CHP - HDP jî dakevin qadan û daxwazê ji xelkê bikin ku bêjin "na."

ROJEVA sîyaseta Tirkîyê destûra nû û amadekarîyên destûrê ne. Dihête çaverê kirin ku 16 Nîsanê de referandum pêk bihêt û xelk herin ser sindoqan. Nivîskarên nêzîkî AKP û MHPê eşkere dikin ku herdu partî danûstendinan liser amadekarîyên referandumê dikin û mumkin e bi bangeşeyeka hevpar amade bikin. Pêşnimaya guherîna destûrê bi dengên parlementerên AKPê û MHPê li meclîsê hatibû qebûl kirin.

Li alîyê din CHP – HDP û alîyên din ên opozîyona Tirkîyê jî dest bi amadekarîyan kirine. Dihête çaverê kirin ku HDP û CHP jî li qadan dijberîya pêşnimaya destûrê bikin û daxwazê ji xelkê bikin ku ew bêjin "na." Partîyên bakurê Kurdistanê jî heta niha helwêsta xwe beramber referandumê de eşkere nekirine û wan jî derbarê referandumê de helwêsta partîyên xwe neanîne ziman.

Esnaf û hemwelatîyên Amedê, kelegerma referandumê ji heftenameya Basê re nirxandin. Hinek esnaf û hemwelatî eşkere dikin ku ew dê bêjin "na " hinek jê jî eşkere dikin ku ew dê neçin ser sindoqan û ew dê "boykot" bikin û hinek kes jî rave dikin, eger mafê kurdan ê bingehîn û serwerî di pêşnimayê de bihata parastin wan dê bigota "erê."

"Em dihêne xapandin"

Esnafekê Amedê ji vê referandumê re dibêje "na" jiber di bawerîya wî de eger Recep Tayip Erdoğan biçe jî li şûna wî kesekê din dê bibe serokkomar. Bi bawerîya wî eger Kemal Kılıçdaroğlu an Devlet Bahçeli li Tirkiyê bibin desthilatdar Tirkîye dê tevlihev bibe û wiha pêde diçe: "Her kurdekê bi rûmet divê ji vê referandumê re bêje "na" jiber ku mafê kurdan di van guhertinan de tune. Dewleta Tirkîye hertim kurdan dixapîne wekî mînak jî em dikarin pêvajoya çareserîyê nîşan bidin. Em wekî kurd heft caran xwe di nava kevserê de bişon jî em dîsa kurd in."

"Mafên me nayên parastin"

Dema em silavekê didin solfiroşekî û daxwaza axaftinê lê dikin keserekê dikîşîne wiha dibêje: "Gelek tişt hene ku ez dixwazim bêjim lê em ditirsin, em hatine rewşeka wiha ku mirov jiber fikrên xwe dikevin zindanan. Ez ti carî ji vê referandumê re nabêjim 'erê.' Jibo min jibo kurdan tiştek tune ku ez bibêjim erê. 18 xalên desturê hatine guhertin di kîjan xalê de navê kurdan heye? Vê dewletê ji bo me çi kirîye ku ez ê ji wan re bêjim 'erê.' Niha tiştek di destê kurdan de tune lê ev rewşa dijwar helbet heta dawîyê nadome jî dê rojekê kurd jî mafên xwe bi dest bixin. Ewqas şer û pevçûn li navçeya Sûrê rû da dewletê got emê alikarîya we bikin, çar mehan dikanên me girtî man tenê pereyê kirîya mehekê dan me!"

"Encam erê be"

Zilamekê navsere liber dikana tutinê runiştîye serê wî di ber wî de tutinê dipêçe fikrên xwe bi awayekê bêhêvî yek bi yek ji me re dibêje: "Em bixwazin û nexwazin jî dê ev referandum biserkeve û dê piranî erê jê derkeve û sîstema serokatîyê jî dê bînin Tirkîyê. Heger kurd bibêjin na jî bawer nakim ti feydeya wê hebe. Heger bi rayên kurdan ev rewş bihata guhertin min ê bigota na, ligor texmîna min dê qezenc bikin. Lê ev jî rastîyek e em nizanin ka di naveroka van guhertinan de çi heye, belkî ji kurda re baş be jî lê em nizanin.

"Em nizanin di destûrê de çi dihête guhertin"

Bazirganekê li navçeya Sûrê dixebite bîranîna xwe ye di dema salên 80ê bi me re parvedike dibêje: "Dema Kenan Evren de referandum hat çê kirin ez li gundekê Bismilê bûm wê demê me got "na."Piştî sindoq hat vekirin û ji sindoqa gund na derket, hatin em girtin. Em birin qereqolê û li wir li me xistin ji me re gotin çima we gotîye na. Gelek xalên destûrê hatine guhertin lê em van xalên ku hatine guhertin nizanin lê tişta ku em dizanin di meha Nîsanê de dê ev referandum bihête kirin.

"Ev referandum ne ya kurdan e"

Ciwanekê ku li dikana kincan dixebite biryar daye referandumê boykot bike û daxwaza wî jî ew e ku kurd hemû wê boykot bikin, sedema boykotkirinê jî wiha raberî me dike: "Dema kurd hemû boykot bikin wê demê hêza kurdan dê bê fêmkirin." Xebatkarê ciwan dibêje ti karê kurdan li meclîsa Tirkîyê tune divê yek kurdek li meclîsa Tirkîyeyê nemîne û qanûnê wê jî nasnekin û wiha berdewam dike: "Ev referandum ne ya kurdan e ti eleqeya kurdan bi sîyaseta Tirkîye yê tune. Hêvîya min ev e ku dagirker ji Kurdistanê derkevin. Divê kurd hemû ji bo serxwebûna Kurdistanê têkoşînê bikin, divê kurd ji bo demokratîkbûna Tirkîye têkoşînê nekin."

"Divê çima erê û çima na ji xelkê re bihête eşkere kirin"

Li çarsîya şewîtî em welatîyekê ku demekê li dibistaneka Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê mamostetîya kurmancî dikir jî rast hatin. Piştî ku Qeyyim bo şaredarîyê hat tayîn kirin ji karê xwe bûye. Eşkere dike ku ew dê di referandumê de bêje "na" û wiha ji me re diaxive: "Ezê ji vê referandumê re bêjim "na" lê sîyasetmedarên ku me temsîl dikin divê bo me zelal bikin ku em bo çi dengê "na" yan "erê" bi kar bînin. Jiber ku herkes fêm nake, ez bi xwe rojevê dişopînim lê esnafên vê derê ez dibînim ku gelek ji wan ti agahîya wan liser referandumê tune, sîyasetmedarek çi bibêje ew jî wê dibêjin. Ya rast ez ne dixwazim bêjim "erê" ne jî "na" ji ber ku Tirkîye min eleqadar nake, em bi awayekî di nav sîyasetê de ne lê em însanên kurdistanî ne. Ji xwe li Tirkîyeyê tiştekê fîîlî heye tenê dixwazin ev fermî bibe. Dawîya dawî dê meseleya kurd çareser bibe lê ne bi daxwaza tirkan bi zora kurdan ev dê pêk were."

Referandum di rojeva esnaf û xelkê Amedê de ye jî. Hinek ji esnafên Amedê eşkere dikin ku pêşnima ne bi dilê wan e û ew dê bêjin "na." Gelek esnaf û karmend jî dibêjin, eger di destûrê de mafê kurdan ên bingehîn hatiba parastin wan dê bigota "erê."

"SÎSTEMA FEDERATÎF DI DESTÛRÊ DE HEBÛYA MIN Ê BIGOTA ERÊ"

Xwedîyê kafeyeka li Amedê dibêje heger di destûrê de bo kurdan sîstema federatîf hebûya wê demê wî dê bigota "erê" lê dibêje niha rewşek awarte heye parlementer di zîndanan de ne ti hêvîyek wî ji referandumê tuneye û wiha didomîne: "Ligor fikra min ez bawer nakim ji vê rewşê wêdetir tiştek bibe. Tiştekê nû nînin Tirkîye dibe ku ev rewşa niha xirabtir bibe bawer nakim ber bi başbûnê bibe. Li parlementoya jî bi awayekê sererast ev nehat nîqaş kirin wekî kurdekî ez bawer nakim li wir temsilîyeta dengê min heye. Li kuçeyan jî ti çalakî nahên kirin mesela fikra te na ye tu dixwazî liser wê nîqaşan bikî lê şert û mercên demokratîk tune ku tu vê nîqaş bikî ji xwe em li welatekê demokratîk jî najîn berî sed salî dema komara Tirkîye ava bû jî rewş wiha bû kurd dîsa li derve mabûn piştî sedsalî dê şansek çêbûya ji nû ve belkî destûrek nû bihata çêkirin lê ev dîsa dihêt rûxandin. Di xalên ku hat guhertin jibo kurdan sîstema federatîf hebûya wê demê min ê bigota "erê." Ji bo vê jî demokrasî pêwîst e li cîyê ku sîstema demokrasîyê tune ya federatîf jî nabe. Ya girîng ev e ku hemû xalên destûrê demokratîk be."

EKREM ÖNEN

Şiûra neteweyî li bakur çima lawaz e?

Di serdema Osmanîyan de mîr û begên kurdan otonom bûn û kurd wekî civat liser nirxên xweyî civakî û neteweyî radibûn. Ev prosesa otonomtîya mîrên kurdan mirov dikare bêje heta destpêka sedsala XIXan dewam kir.

Serdema modernîte û netewebûnê bi xwe re tranformasyoneka mezin di împaratorîya Osmanî de anî û derencama wê de li Tirkîyê komareka otorîter liser prensîpên kemalîzmê hate ava kirin. Li Tirkîyê fikrên neteweperestî û "sekularîst" liser civatê ferz kirin. Bêguman sîstema otorîter li Tirkîye kokê wê dighêje demên kevn, ev sîstem bi Jon -Tirkan û tanzîmatê dest pê kir û bi kemalîsmê re li cîh runişt.

Di qirnê XIXan de li Ewrûpa di serdema kolonyalîzmê de fikr û qeneta hakim ew bû ku ziman, dîn, reng û kultura ewrûpayîyên spî ên herî baş e. Diyar e qesda M. Kemal ji "muassir medeniyet" ev bû. M. Kemal wekî walîyekê kolonyalîzmê li xelkên Tirkîyê û Kurdistanê dinerî.

M. Kemal di bin navê "muassir medeniyet" hemû nirxên civakî, millî, dînî û kultûrî yên kurdan red kir, di bin navê modernîzmê de, dixwast qenaetekê çê bike, ku gûya kultur, ziman, elîfba, adet û teqalîdên kurdan paşde mayîne û divêt bihêne îslah kirin, ji lewre pêşî êrîş anîn ser medreseyên kurdî, ku navenda rewşenbîrîya kurdan bû. Di van medresan de kurd ne bes bi ilmê ruhanî de, lê herweha di warê ziman û edebyata kurdî, matematîk, fîzîk, kîmya, bîyologî û astronomî de jî dihatin perwerde. Tişta herî grîng ev tev bi zimanê kurdî bûn. Kemalîstan baş dizanî bûn medreseyên kurdî ji nav nebin, nakarin lihember kurdan bi ser kevin.

Di serdema cumhûrîyetê de bi qanûna Tevhid-i Tedrisat (3 Adarê 1924an de hate ragihandin), loma medreseyên li nava tirkan hatin girtin lê ên li Kurdistanê karê xwe bi dizî dewam kirin. Dewletê jibo bikaribe rê li ber karê medresan li Kurdistanê bigire, alimên kurd kire armanca êrişên xwe û gelek berhemên wan ji holê rakirin.

Kemalîstan alfabeya erebî jî di bin navê ku alfabeya latînî ''pêşketîye" qedexe kir. Xerrîbîya mezin ew e ku niha jî hin kemalîst li Tirkiyê weha difikirin, nikarin binerin ew bi alfabeya xwe yî latînî li ku ne û Japon, Rûsya, Kore û Çîn ku alfabeya wan ne latînî ye li ku ne?

Kemalîzm berdwamîya Îttîhad û Tereqîyê bû ku ji welatên Balkanan hatibûn û hemû sîxurên Teşkîlata Mahsûsîyê bûn. Piştî ku xelkên Balkan ji bin hukumdarîya Osmanî rizgar bûn, ew dê bihatana ceza kirin, loma tevde revîyan hatin Tirkîyê. Ev ajanên ku qatilê xelkên xwe li balkan bûn texmîn bikin ku li hember kurdan çi qetlîam kirine.

Dewleta Tirkîyê jibo bikaribe kurdan asîmile bike "îmam hatîp lîsesî" vekirin. her çiqas dihête gotin ku Imam Hatip Liseleri di 1951an de bi hatina Demokrat Partî liser hukum vebûye jî lê di rastîya xwe de koka wan lîseyan dizivire sala 1928an. Ew di serdema CHPê de hatine vekirin. Bi vekirina Lîseyên Îmam Xetîb xwastin kurdan asîmîle bikin û melayên kurd fêrî tirkî bikin. Li hember vê zordarîya kemalîstan milletê kurd hew dikarîbû tehemul bikira û dest bi serhildanan kir.

Di sala 1958ande dema Barzanî yê nemir ji Sovyetê vegeriya, şiûra millî li herçar perçeyên Kurdistanê xurt bû herweha li bakurê Kurdistanê jî di nav hinek xwanda de ku ew jî bêhtir yan zarên mela an jî zarên serokeşîran bûn, lê bi giranî di nava serokeşîr û seydayên ku ji medreseyên kurdî dihatin xurt bû. Vê derdorê di sala 1965an de xwe li dora fikrekê konservatîv sosyal bi helwesteka millî bi rê xistin. Ev proses heta salên 1980an dewam kir. Paşê ew jî ji hev belav bû. Xwandeyên ku xwe "sekuler" dihesibandin giranî di nava çepê tirkan de an bi serên xwe wekî çep xwe bi rê xistin, lê çepên ku ji fîltera kemalîzmê derbas bûbûn. Problema çepên kurd ew bû û ew e, çepîtî di qalibê tirkîtîyê de wergirtin. Bi berhemên tirkan perwerde bûne. Ev û perwerdeya dibistanên tirkan bi hev re bûne sebebên ku li bakur çîneka bi zihna kemalîst lê bi rûyê xwedêgravî "Çepîtîyê" derkeve holê. Zihniyeteka wisa ku lihember nirxên xweyî neteweyî derkevin. Ev proses nuha bi formeka nû bi navê "demokratîk cumhûrîyet, ortak vatan" berdewame.

Lihember vê siyaseta kemalîstan, milletê kurd bêparastin e, xwandayên wê jî qismekê mezin, yên bi zanetî û yên di bin hişmendîya xwe kemalîst in. Problema herî mezin ew e ku gazin ji kemalîstên nava kurdan nabe. Bes gelek kes di binhişmendê xwe de kemalîst in û nizanin, ev jî problema hinek ji tebeqa siyasî a bakurê Kurdistanê ye. Wekî mînak, nabe yek him serxwebûnxwaz be û herweha piştgirîya entegrasyon û welatekê muşterek bi tirkan re bike, li vir nakokîyek heye, ew kesana vê nakokîyê nabînin. Jiber wê jî gelek caran helwêstên wan li hember bûyeran, bê ku zanibin bingehê wê kemalîzm e. Heta kurdên Bakur ji vê nexweşîya kemalîzmê rizgar nebin rewş her ku biçe wê xerabtir be. Kurdên Bakur niha ji her demê bêhtir muhtacî fehm û şiûra millî a kurdî ne

Qeyrana Sûrîyê

Fokus Reqqayê!

Piştevanîya Amerîka bo hêzên HSDê li Sûrîyê û Rojava berdewam dike. HSD roj bi roj zêdetir nêzîkî Reqqayê dibin. Ligor çavkanîyên xwecî HSD heta 8 km nêzîkî Reqqayê bûye.

DERYA KILIÇ

BAJARÊN Reqqa û Mûsil bi awayekê defakto wekî "paytextên" DAIŞê dihêne hesibandin û DAIŞ li wan herêman gelekî bihêz e. Di serdema Serokê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) Obama de Hevpeymanîya Navneteweyî bi hêzên herêmî jibo bidawîanîna DAIŞê û rizgarkirina Mûsil û Reqqayê bername amede kirin û dest bi operasyonan kirin. Bi serpereştîya DYA, Hêzên Navneteweyî yên Hevpeyma, Pêşmerge û Artêşa Iraqê di meha Cotmehê de li Mûsilê dest bi operasyonê kir. Operasyona Reqqayê ji alîyê Hêzên Sûrîyeya Demokratîk (HSD) ve ji 6ê Mijdara 2016an ve dest pê kir. Jibo DAIŞ di her du bajaran de bihêt ji nav birin, operasyon berdewam dikin.

Ji alîyê din Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyip Erdoğan û Serokê DYAyê Donald Trump di 8 Sibatê de bi rê ya telefonê axivîn. Rayedarên Amerîkayê derbarê naveroka civînê de zanyarî nedan. Lê rayedarên Tirkîyê civîn bi awayekê êrenî nirxandin û hinek zanyarî ragihandin. Ligor zanyarîyên ku ji alîyê Rawêjkarê Serokkomar İbrahim Kalın û Wezîrê Derve Mevlüt Çavuşoğlu hatîye dayin, Trump û Erdoğan derbarê PYD û FETÖ de axivîne. Herwiha di nav mijara PYD/YPGê de Operasyona Reqqayê jî hebû. Kalin liser vê mijarê dîyar kir ku ew derbarê Reqqayê de dosyayeka baş pêşkêşî DYAyê kirine û her du alî jî liser Bab û Reqqayê li hev kirine. Çavuşoğlu ragihandîyê ku plana wan ya Reqqayê heye. Çapemenîya DYAyê derbarê van gotinan de ti zanyarî ranegihandin.

Gelo Trump soza Reqqayê dayê Tirkîyê?

Pêwendîyên Tirkîye û DYAyê di serdema rêveberîya Obama de jibo Operasyona Reqqa û YPGê xerab bûbû. Jiber ku DYA, daxwaza endamê xwe yê NATO û Peymana Navneteweyî Tirkîyê qebûl nekir û piştevanîya YPGê kir, Tirkîyê aciz bûbû. Ji lewre Tirkîyê ji rêveberîya Trump hêvîdar e û dixwaze pêwendîyên xwe pêş bixe. Jiber vê lidijî biryara Trump a qedexe ya misilmanan bêdeng mabû. Lêbelê Trump çiqas alîkarîya Tirkîyê û çi qas YPGê dike zêde nedîyar e. Ji gotinên Trump rojanameya Basê hin analîzan çê kirin.

Trump di serdema hilbijartinê de bi rojnameya New York Times re hevpeyvînek çê kiribû û di vê hevpeyvînê de derbarê pêwendîyên xwe û Tirkîyê de gelekî êrenî axivî û got: "Ez bawer dikim ku em dikarin bi hev re lidijî DAIŞê baş bixebitin." Ji alîyê din Trump dixwast Tirkîyê û hêzên kurd nêzîkî hevdu bike.

Herwiha Trump Nûnerê Taybet yê Surîyê û Iraqê yê Obama neguhert. Ligor pisporan ev jî nîşana neguhertina polîtîkayên derve yê DYAyê ye. Sîyasetzan eşkere dikin ku gelek caran gotinên serokê dewlet û polîtîkayên dewletê li hev nagirin. Jiber ku serokên dewletan dikarin rojevê çê bikin. Peywireka wan ya wisa jî heye.

Berdevkê Heveymanîya Navneteweyî Dorrian di daxuyanîya xwe de derbarê Reqqayê de dîyar kir ku 6 meh mayê Reqqa û Mûsil bi gelemperî bihêne dorpêç kirin. Ligor çavkanîyê herêmê, DYA di vê merheleyê de dê dev ji YPGê bernede û HSD jî naxwaze bi Tirkîyê re, Tirkîyê jî naxwaze bi YPGê re bixebite.

Endamê TEV-DEMê Aldar Xelîl, Hevserokê Desteya Parastina Kantona Cizîrê Rezan Gulo, Rojnameger Fehim Taştekin û Endamê ENKSê Muslîm Muhammed derbarê wan rûdanan de bi heftenameya Basê re axivîn.

Rojnameger Fehim Taştekin: Îhtîmala şerê PKK - YPG û Tirkiyê heye

Rojnameger Fehim Taştekin êrişên Tirkîyê yên li Rojavayê Kurdistanê û Reqqayê nirxand. Taştekin liser ihtimala çêbûna şer di navberî YPG, PKK û Tirkîyê de rawestîya û dîyar kir ku demeka dirêj e îhtimala şerê PKK, YPG û artêşa Tirkîyê li Rojava heye. Lê ka her du alî vî şerî dixwazin yan naxwazin girîng e. Ji alîyê din ve di demên dawîyê de di navbera her du alîyan de rewş xetertir dibe. Çawa artêşa Tirkîyê êrişî alîyê Efrîn û Kobanê dike; YPG jî ji alîyê Efrîn û Kobanê ve êrişî sinorên Tirkîyê dike.

Taştekin axaftina xwe ya liser vê mijarê wisa domand: "Heger Tirkîyê bixwaze dikare bi rehetî bikeve Menbîc û Efrînê. Lê ew tenê wan herêman bomberan dike. Heke Tirkîyê bikeve wan deran, dê bi gelek nerazîbûnan rûbirû bihêt û ev dê rê liber şerekê mezin veke. Herwiha heger êrişek lidijî kurdên Sûrîyê çê be, kurdên Tirkîyê jî dê bêdeng nemînin. Sedemeka din jî ev e ku rejîma Sûrîyê dê destûr nede tiştekê wisa pêk bihêt. DYA jî heye. wekî ku dihêt zanîn DYA hevalbendê YPGê ye. Tirkîyê van tiştan dide berçav û bi baldarî tevdigere. DYA çend caran jibo Menbîcê bi Tirkîyê re nîqaşên dijwar kir."

Endamê ENKSê Muslim Muhammed: Ne rast e sivîl bihêne bombebaran kirin

Endamê ENKSê Muslîm Muhammed derbarê serbestberdana endamên xwe de axîvî û got: "Ligor min serbestberdana endamên me normal e. Ev peyam yan jî qonaxeka nû nîne. Di demên borî de endamên me hatin serbest berdan û piştre jî hatin girtin. Êre, berdan heye; lê PYD girtina endamên me berdewam dike. Ango bi wan serbest berdanan naxwazin têkevin qonaxeka nû ya danûstendinê. Ev dê helwêsta xwe ya çewt bidomînin."

Herwiha Muhammed êrişên Tirkîyê şermezar kir û dîyar kir ew wekî ENKSÊ êrişên tirkan şermezar dikin. Ne rast e jî sivîl bê bombebaran kirin û bombe bihêt avêtin ser kurdan.

Endamê TEV-DEMê Aldar Xelîl: XWE WEKÎ SERKIRDE Û FERMANDARÊ VÊ XAKÊ DIBÎNE

ENDAMÊ TEV-DEMê Aldar Xelîl derbarê armanca êrişên Tirkîyê nirxand û da zanîn ku armanca Tirkîyê ew e ku projeya Demokratîk a bakurê Sûrîyê xerab bike. Jibo vê jî êrişî El-Bab kir û Şehba û hin gundên Efrînê bombebaran dike. Xwe wekî serkirde û fermandarên vê xakê dibîne. Heleb xistîye bin bondara xwe. Niha hewl dide Reqqayê jî têxe bin bandora xwe. Divêt dewleta Sûrîyê û xelkên Sûrîyê jibo vê dagirkerîya dewlata Tirkîyê tiştekî bibêjin.

Xelîl bal kişand ser îdiayên PKK û YPG û wiha got: "PKK tevgereka li bakurê Kurdistanê ye û xwedî bandor û bihêz e. PYD, TEV-DEM û Xweserîya Demokratîk rêxistinên Rojava ne. Bi hemû hêzên Kurdistanê re pêwendîyên me hene. Ligor me di navbera Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojavayê û hêzên wan de ti cudabûn tine."

Hevserokê Desteya Parastina Kantona Cizîrê Rezan Gulo: Hikûmeta Trump zêdetir piştevanîya HSDê dike

Rezan Gulo derbarê piştevanîya DYAyê ya HSDê û Operasyona Reqqayê axivî û eşkere kir ku HSD aniha 8 km nêzîkî navenda Reqqayê bûye. Hikûmeta Trump zêdetir piştevanîya HSDê dike û dê vê piştavanîya xwe frehtir bike. Dewlata Tirkîyê li Babê îflas kirîye. Nikare li vê derê serbikeve. Jiber vê nikare têkeve Reqqayê û aniha Reqqa hatîye dorpêç kirin. Di demeka nêzîk de HSDê jî dê ketina xwe ya nava bajer ragihîne. Jiber vê ti pêwîstî bi Tirkîyê tine. Tirkîyê wekî dagirker li xaka Sûrîyê ye û ligor pîvana mafên mirov û hiqûqê divêt ji Sûrîyê derkeve.

HOŞENG OSÊ

Mazlum Doğanê em hîn wî nas nakin

"Dema PKKê behsa girtîgeha Amedê dike, piştî cunta 12ê Eylûlê, mirov dibêje qey jibilî endam û berpirsên PKKê yên girtî, ti berxwedêr û şoreşgerên din di zindanên Tirkîye de nînin. "

Ligorî ku min di pirtûk û edebîyatên PKKê xwandîye û li medya guhdar û temaşe kirîye, dema PKKê behsa girtîgeha Amedê dike, piştî cunta 12ê Eylûlê, mirov dibêje qey jibilî endam û berpirsên PKKê yên girtî, ti berxwedêr û şoreşgerên din di zindanên Tirkîye de nînin. Bi vî şêwe û rêbazî dîroka PKKê bi me hatîye nasandin ku rêxistin, tevger û partîyên din yên kurd li bakurê Kurdistanê bê dîrok in. Dibe ku PKKê vî mafî bide xwe ku dîroka berxwedana li girtîgeha Amedê liser navê xwe tapû û tomar bike, lê partî û rêxistinên din çiqas karîbûn rastîya berxwedana endam û berpirsên xwe yên girtî bidin nasandin?

Di navbera dîroka fermî ya dihête nas kirin û dîroka veşartî de gelek çîrokên cuda û ji hev nakok bi bûyerê re peywendîdar hene. Kî bixwaze navê M. Doğan bide "Google, Youtube û Wîkîpedîya"ê dê bi sedan "lînk" bibîne, dibe ku nivîs, lêkolîn, helbest, raport ya jî belgefîlm bin, lê tevde di çîrokekê de hevbeş in ku di şeva 21ê Adara 1982an de, Doğan lihimber zilm û zordarîya cunta Tirkiyê û himberî xîyanetê agir berdaye bedena xwe û qîrîyaye û gotîye; "berxwedan jîyan e". Ev şirove-çîroka bûyera M. Doğan di mejîyê giştî yên kurdan de rûniştîye, heçku rastîyeka dîrokî ye û ti şik û guman liser nîne. Lê rojnameya "SERXWEBÛN"ê ku rojnameya navendî û fermî ya PKKê ye, di hijmara xwe ya 5ê, Gulana 1982an de, derbarê bûyera Doğan de çîrokeka din dibêje.

Dibe kêm kes zanibin ku M. Doğan di kongreya damezrandina PKKê de 27/11/1978an de wekî berpirsê ragihandinê hate destnîşan kirin û derxistina rojnameya rêxistinê "SERXWEBÛN" peywira wî bû. Ev rojname, di destpêka xwe de, wekî çend rûpelên gelek normal û bi dizî dihat çap û belav kirin, lê piştî PKK li Almanya bi cî bû, di çileya 1982an de li bajarê Kölnê yê Almanya, yekemîn jimar, bi çapeka fermî û profisyonel derket pêşberî xwandevanên xwe. Ez vegerîyam arşîva rojnamê û min hemû "PDF"ên hijmarên wê peyda kirin û min dît ku "SERXWEBÛN" piştî 2 mehan bi ser "çalakîya" Doğan re, di rûpera 1ê ji jimara 5ê Gulana 1982an de, bi manşeteka sereke behsa bûyera zindana Amedê dike: "Komkujî li Amedê çêbûye. Endamê komîteya navendî ya PKKê M. Doğan û gelek endamên din yê PKKê milîtan û welatparêzan jîyana xwe ji dest dan." Di vê nûçeyê de, qet behsa xweşewitandina Doğan û mebesta wî ji çalakîyê nayê kirin, lê dihête gotin ku Doğan û hevalê wî di komkujîyê yan şewitîne yan fetisîne. (http://serxwebun.org/arsiv/05/). Ne tenê wisa jî, ji hijmara 5ê tan 12ehan, ticarî nehatîye gotin ku Doğan xwe himberî zilm û xîyanetê şewitandîye!

Piştî salakê; di Gulana 1983an de, derbarê salvegra 1emîn ya bûyerê de, PKKê daxuyanîyeka taybet derxist û di rûpela 14an ji jimara 16an - Nîsana 1983an de, bi zimanê kurdî belav kir. Di wê daxuyanîyê de dibêje: "Girtîyên şer ku ji sê salan zêdetire di girtîxanan de bi fedekarîyên giran bi biryarî têkoşîna berxwedanê bilind kirine. Endamê KM (Komîta merkezî) ya PKK Mazlum Doğan, dûre, ji kadroyên rêber yên PKKê Ferhat Kurtay, Eşref Anyak û Mehmut Zengin ku bi şewitandinê û fetisandinê hatine kuştin, ev bûyer jî eşkere û xuyane ku: dijmin bi hemû hêrsa dîrokî û êrîşbazîyên dijwar hemberî hêvîyên serxwebûnê û tekoşîna gelê me ketîye û bê fesal maye....".

Di hemû hijmarên "Serxwebûn"ê yên 1983-84-85an jî dubare û berdewam dike, lê kengî dihête guhertin gotin; "Doğan xwe şewitandîye" û hinek "fantazîya" û "efsanebûn" derbasî çîroka bûyerê dibe? Piştî ku PKKê berpirsê rêxistina xwe yan Ewropa Çetin Güngör (Semîr) ku ji rêxistinê veqetîyabû, kuşt, û bi taybet piştî kongreya PKKê ya sêyemîn ku di sala 1986an de li Sûriyê li dar ket. Jixwe di hemû hijmarên "Serxwebûn"ê yên salên 1982an ta 1985an de, wêneyên Öcalan pir kêm dihatin belav kirin û Öcalan tenê bi "sekreterê giştî yê PKKê" dihat bi nav kirin, û ji sala 1986an û virde, wêneyên wî gelek car dihatin belav kirin û di hijmarên wê salê de, yekemîn car navê "serok", "serokatîya partîyê", "serokê neteweyî" ji bo Öcalan hat bikaranîn.

Dibe hinek kes bêjin: "mafê PKKê ye di çîroka çalakîya M. Doğan de guhertinê çêbike, jiber ku pêwîstî bi peydakirina hin sembolên neteweyî û şoreşgerî hebû". Ev jî rast e, lê dema mirov li hijmarên "Serxwebûn"ê vedigere, mirov baş pê dihese ku M. Doğan, K. PİR, M. H. Durmuş û F. Kurtay berê sembol bûn, û wêneyên wan di rojnamê de û di şev û şahî û çalakîyên PKKê de, berî bûyera zindana Amedê, ji wêneyên Öcalan jî bêtir dihatin belav kirin û hildan.

Berî çend rojan, min berpirsekê payebilind yên PKKê ku ji rêxistinê veqetîyaye û şahidê gelek tiştên girîng e, li Almanya dît û ji min re got: "Doğan ne xwe şewitandîye û ne jî di şewata girtîgeha Amedê de hatîye kuştin, lê wî xwe darde kirîye, ango xwe sêdare kirîye". Lê jiber ku ev nivîs xwe dispêre jimarên "Serxwebûnê û daxwîyanîya PKKê yan Gulana 1983an, em rûberûyî 2 çîrokan in, û yek ji her dûyan ne rast e, yan jî dibe ku her dû jî ne rast bin:

I-Eger çîroka yekemîn (1982-1985) rast be, nexwe yan din ne rast e. Li vira, çima? Û ber çi PKKê ev çîroka bi gelê kurd wekî rastî da qebûl kirin?!

II-Eger çîroka duyemîn rast be, nexwe PKKê derbarê bûyera zindana Amedê ji salan 1982an ta 1985an rast nedigot. Jê zêdetir û wêdetir, eger çîroka duwemîn rast be, nexwe PKKê rejîma cunta faşîst a 12ê Eylûlê ji "komkujîya" li girtîgeha Amedê berî dike.

Îmaja kurdan di dîroknigarîya dewletgerane de-V

Vegêrrana dewletgerane ji berxwedana kurdan

KAMAL SOLEIMANI

Dî vatişa îdeolojîk a dewletê de, ku têde artêş û netewe heman in, 'siyaseta navlêkirinê' sînorên sloganê têper dike. Trîbalîsm, yan eşîretgerî/qebîlegerî, ligor wê têgihîştinê, qedexe ye kalîteyên nasyonalîstî hebin – evca çi kalîteyênê qenc yan xirab – û bi heman teherî wekî nexweşîyekê hatîye ruwanîn, ku divêt ji neteweyê bihête neşter kirin. Ji perspektîva statîst, ango dewletgerane, mukurhatina bi hebûna berxwedana kurdî (û ji lewre berxwedana neteweyekî) dê bihata wataya mukurhatin bi ne-yekhejmarbûna neteweyî li Îranê. Liberçavnegirtina aspekta etnîk, û bi eşîretgerî navlêkirinê, armanceka praktîk hebû: rewakirina jinavbirina fîzîkî ya wê yekîneyê etnîk, ango kurdan. Gava ku ev yekîne [kurd] wekî nexweşî yan astenga lihember pêşveçûna "neteweyê çekdar" [fars/ecem] bihête kategorîze kirin, û heger artêş tecessuma vê neteweyê [ecem] be, yan "di bin fermana îradeya neteweyê [ecem] de" be, her oppozîsyoneka navxweyî [kurd] lidij artêşê dê bihête wataya oppozîsyona neteweyê [ecem] bixwe. Ji lewre, biçûkxistina berxwedana kurdan ligor vatişa dewletê wekî "trîbalîst/eşîretgerane" wê anegorî hevgirtîbûna etno-neteweyî ji rewatîyê diêxe û wê wekî berxwedaneka lidij qanûn û pergalê pênase dike û herwiha wekî hewlekê bo redkirina netewe-dewletê li qelem dide; netewe-dewleta ku ew berxwedêr deyndarê mafê hemwelatînî û avantajên wê ne!

Dewleta Îranê, wekî ya Tirkiyê, bi rêka trîbalîzekirin (bi qebîle wesif kirin) a kurdan, wan dixe qefesekê ku Butler û Spîvak wê wekî teşegirtineka taybet ya "desthilat û zorê ku jibo hilberîn û ragirtina statukoya rewşa mehrûman hatîye dariştin" pênase dikin. Bi jêstandina "girêdayîbûna hiqûqî" statuya kurdan bo berjehê (lîmbo) hatîye avêtin, jiber ku dewlet bi termînolojîya krîmînalîteyê, bo nimûne wekî qebîleger û eşqîya, amajeyî wan dike. Bi wî teherî, bidestveanîna hemwelatînîya îranî û tirkî jibo kurdekî/ê pêdivî bi înkara zanavê xweyî ye û di heman demê de pejirandina hemkat ya krîmînalîzekirina derbirrîna zanavê kurdî ye. Bikaranîna qebîlegerîyê di vatişa destpêka sedsala bîstan de bibîrhînerê têrma "terorîzma" îro ye; ku heger ev navlêkirin ji hêla dewleteka bi hêz ve bihête encam dan, derencama wê dibe jinavbirina grûpa subjektê. Hoz û qebîle, wisa dihêne pênase kirin, ku gûya xasîyetên gerdûnî yên eyan hene, karakterê hevpar û nîgarên yeksan yên reftarê hene, evca kengê bijîn û li ku bijîn ferq nake. Gava ku dewletê milletek wekî qebîle destnîşan kir, hingê erka xwe dibîne, ku bi hemû hêza xwe"rêbaza jiyana wan" bi hemû awayî têk bide.

Erka dewlet-neteweya modern ew e, ku xelkê bi şivê medenî bike, jiber ku qebîle, wekî yekîneyeka "berî-modern" jibo dahundirandina modernîteya medenî bêmeyl, bêşiyan û sist e, û nikare bi sur'et û xêrayîya guhertinên modernîteyê re bigehîje. Vê paşveavêtina trîbalîsm bo rabirdûyê bihayekê mezin qazanc kir û meşrûîyet da hêzên kolonyal li sertanserê dinyayê ku destêwerdanê di dêsmanên (struktur) xwemalî de bikin.

Dîroknigarîya dewletgerane ya eceman, wekî ku me nîşan daye, meyleka sazîkirina helwêsta xwe heye, meyla ku her boçûn yan helmeteka "trîbalîst" bo nasyonalîzma dewlet-rewa wekî gefekê bi nav dike. Di dema daguhertina formulasyona sazîyane ya nasyonalîzmê de, trîbalîsm wekî berçespeka xirab, ku renge ti peywendî bi nasnameya hozekî re nebe jî, hatîye peyrew kirin, daku rê nedetê bibe xwedîyê sifetên nasyonalîstî. Çunkû heger rê bide mukurhatina girêdan û welayên pirçeşn, bi taybet yên nasyonalîstî, dê bi ruwangeha tercîhî ya dewletê re di nakokîyê de be; dewleta ku xwe fermandarê yekane yê girêdana bi otorîteya navendî dibîne.

Ji lewre, komelgehên ku çendîn çavkanîyên zanavî hene, divêt ji gêrrana her roleka avaker di dewlet-neteweyê de bihêne qedexe kirin. Vê yekê doza dewletê liser welaya komelgehan bo otorîteya hikûmetên navendî lawaz kir, jiber ku ev komelgeh hem mecbûr bûn vatişa nasyoalîzma hegemonîk dahundirînin hem jî zanav û welayên xwe înkar bikin, yan jî nasnameyên xwe yên xwecîyî biparêzin lê ji parêzvanî û avantajên ku dewlet-neteweyeka bihêz dabîn dike, mehrûm bin.

Bi teherekê siruştî, vatişa pênasekirina gelan wekî qebîleyan, beşek bû ji hewla ku hêzên kolonyal wekî bikerên rasyonel bide nasandin û gelên berxwedêr bi etîketa trîbal/qebîleyî wekî îrrasyonel/ne-eqlanî û paşvero şirove bike. Dewletên Rojhilata Navîn, bi hêvîya têkbirina berxwedana komelgehên bindest, heman vatişa kolonîyal peyrew kirine, ku wextekî hêzên derekî bi ser wan de sepandibû. Lê dewletên Rojhilata Navîn di helmeta çewsandina komelgehên bindest de, di berawird bi hêzên derekî yên kolonyal re, şiddeteka bêpêşîne û bêwêne bi kar anîn.

Argumenta me li vir ew e, ku pênasekirina vê nakokîyê di navbera netewe-dewlet û komelgehên bindest de wekî nakokîya di navbera modernîte û pre-modernîteyê, modernîteya dewletgerane li derveyî vatişa desthilatê dihêle. Cehda jibo medenîyetê wekî deus ex modernitate (xwedayê ji modernîteyê) hatîye portre kirin, ku gûya cezr û medda heyamê em mecbûrî wê kirine. Lê ketwar ew e, ku ev helmet liser binemayê xwe-berjewendîyên derveyî û hundirî û hewlên wan jibo parastin yan qulibandina peywendîyên desthilatê di navbera komelgehên serdest û bindest de hatîye peyrew kirin. Ji lewre, vatişa trîbalîzekirina gelên bindest dupatkirina wan mekanîzman e, ku alîgirên kolonyalîzmê, gava ku dixwastin vatişên Roşingerîya Ewropî jibo rewakirina mîsyonên xwe yên medenîkirinê, "missions civilisatrices" peyrew bikin, bi kar anîne. Lê heger mirov dîrokê ji wê ruwangehê bixwîne, gelo oppozîsyona di navbera dewlet û kurdan de dê nebe mexdûrê şirovekirina rûdanê ji alîyê dewletê wekî şerekê di navbera rasyonalîte û îrrasyonalîte, modernîte û paşverotî û dawîyê di navbera exlaq û bêexlaqîyê de?

Erka dewlet-neteweya modern ew e, ku xelkê bi şivê medenî bike, jiber ku qebîle, wekî yekîneyeka "berî-modern" jibo dahundirandina modernîteya medenî bêmeyl, bêşiyan û sist e, û nikare bi sur'et û xêrayîya guhertinên modernîteyê re bigehîje.

Li vir ez hindek parafrazan jibo hevtevna tirkî ya osmanî ji Akmeşeyê bi kar dihînim. Binêre Handan Nazir Akmeşe, The Birth of Modern Turkey: The Ottoman Military and the March to World War I (London: I.B.Tauris, 2005), 70–71.

Judith Butler û Gayatri Chakravorty Spivak, Who Sings the Nation-State? Language, Politics, Belonging (London: Seagull Books, 2007), 5.

Helbet, heta niha jî dewlet hebûna hindek hêmanên 'trîbal' tolere dike, daku wan lihember tevgerên nasyonalîst bi kar bihîne. Heman sîyaset hem li Îranê û hem jî li Iraqê, ji serdema mandayê heta dawîya desthilata Seddam Huseyn, hatîye peyrew kirin. Asad destnîşan dike, ku antropologan bi kêmanî sê pênaseyên cuda jibo qebîle/eşîret/hozan hene. Herwiha, nîşan jî dide, ku bo nimûne li Sûdanê, liba qebîleya Kababîş transformasyoneka mezin di demeka kurt de çê dibe; Asad dipeyitîne, ku qebîle dikare ji yekîneyeka serbixwe transformî yekîneyeka hevkarê hêzên kolonyal bibe, paşê bibe hevkarê dewletê û tenanet bikeve xizmeta rêveberîya dewletê bixwe. Binêre. Talal Asad, "Political Inequality in the Kababish Tribe," in Essays in Sudan Ethnography Presented to Sir Edward Evans-Pritchard ed. E. E. Evans-Pritchard, Ian George Cunnison, and Wendy James (London: C. Hurst, 1972).

Hêjayî bibîranînê ye, ku yek ji etûdên herî berfreh yên hevçerx liser eşîrên kurd, tirkmen û yên din li herêmê ji alîyê vajokerê Rêkeftina Sykes-Picot, Mark Sykes ve hatîye encam dan.

Jibo zanîyarîyên bêhtir liser etîka rasyonalîteyê binêrin Partha Chatterjee, Nationalist Thought and the Colonial World: A Derivative Discourse? Third World Books (London, Totowa, and N.J.: Zed Books, 1986), 11–17.

Barazuyi, Mujtaba. Barrasî e Aw□â□ e Siyāsî e Kordestān (az sāl e 1258–1325 / H.) [Vekolîna Rewşa Sîyasî ya Kurdistanê: (Ji 1889–1946)]. Tehran. Fekr e Nō, 1999. , 216.

heman.

Boroujerdi, di Stephanie Cronin. (ed.) The making of modern Iran: state and society under Riza Shah 1921–1941. London: Routledge Curzon, 2003), 150.

Cronin, Stephanie. (ed.) The making of modern Iran: state and society under Riza Shah, 1921–1941. London: Routledge Curzon, 2003. 3.

VATIŞA KOLONÎYAL

Boçûna dîronigarîya eceman liser tevgerên kurd pro-dewlet e. Motîva sereke ya wê ew e, ku biselmîne siyaseta oppozîsyonel ya bindestan meşrûîyeta neteweyî nîne. Dîroknigarîya dewletgerane, çi fermî be çi nefermî, heman xêzên sereke yên dijî oppozîsyona etnîk-bingeh ku lihember dewletê erzî endam dikin, peyrew dike. Bo nimûne, dîroknigarê ecem Barazûyî ti dudilîyekê dernabirre gava ku îdia dike, ku "dîroknigarên îranî bêyî awarte hemî, Simko wekî lîderekê nasyonalîst ê kurd nabîne, belkî wî wekî serekê zalim yê eşîra şikak, ku hemî diz û rêbir bûn, pênase dikin."

Karakterîzasyona wî bi Simko tenê sînorkirî namîne. Barazûyî bê mubala komelgeha şikak bêawarte bi gişti wekî "diz û rêbir" portre dike. Hengavekê wirdetir diçe û dibêje "hilsengandineka durist ji sabiqeya Simko û peyayên wî diselmîne îdiayeka wisa nahête înkar kirin." Bi giştî dîroknigarîya eceman lê digere tevgerên kurd ji neteweyîbûnê dîskalîfîye bike, evca bi erênî be yan nerênî. Piranîya entellektuel û dîroknigarên berceste yên ecem piştevanîya helmeteka wisa dikin, ku "renge wekî karbidestên dewletê yên entellektuel bihêne bi nav kirin," û her van entellektuelan bi rê û rêbazên cuda vatişa nasyonalîst a dewleta ecem vehilberandine. Întellîgensîaya ecem/fars nêzîk desthilata dewletê ye û ji lewre "platforma nasyonalîst ya Seyyid Ziya û Riza Şah jibo hikûmeteka xurt ya navendî teîd kirin." Ji lewre, ew her cûre meylên etnîk/nasyonalîst yên kurdan yan her gelekê ku ne fars bin, wekî hevrikên xebîs pênase dikin ku divêt bihêne ji nav birin.

PIRJEEN SALIH

Karakterên kurdan û nîştimanperwerîya wan ji zardevê gerrokekê ewropî

GELEK gerrok û etnograf li Kurdistanê bûne rêving û lidûv xwe vegêrranên têr û tesellî liser rasthatinên xwe bi mîr, beg û xelkê asayî yê kurd re bi cî hîştine. Di van vegêrranan de wan reftar, bawerî û karakterê neteweyî yên kurdan şirove kirine. Sedsala 19an serdema macerahezên romantîk bû ku rêwîtîya welatên eksotîk bidine ber xwe û paşê serpêhatîyên xwe li welatê xwe biweşînin. Gelek gerrok li welatê kurdan jî gerîyane, him behsê macera û serpêhatîyên xwe kirin û hem jî di qalibê romans û çîrokan de behsê kurdan bi awayên fantastîk kirine. Liser kurdan gelek saloxet hene; ya seyr ew e, ku piranîya van saloxetan pesnê kurdan bi mêvanperwerî, rehahizrî û îtbara wan kirîye, herçende, wekî ku ev gerrok derdibirrin, kurdan renge siruştekê nîv-bejî hebin. Hindek ji van berhemên weşandî taybetmendîne serincrakêş hene, nemaze yên ku saloxetên kurdan di demên tengavîyê de vedigêrrin.

Çend nimûne ji rûbirûbûna kurdan bi zalimên wan re cîyê serincê ne. Di van saloxetan de mirov dikare, wekî ku gerrok pênase dikin, li "hesreta azadîyê" ku hêvîya ebedî ya kurdan e, rast bihêt. Ev serdem, ew serdema ye, ku hêşta kurd bi temamî neketibûn bin nîrê bindestîyê, û bi izzeta nefs ber xwe didan û ticarî hêvîya xwe jibo azadî û serbixweyê nedibirrîn. Di nîveka sedsala 20an de despot û tîranên herêmê ancax karîn wan biêxine bin zincîrên serwerîya xwe. Lê jibo ku wan bikine tabiên xwe û têkoşîna wan jibo azadî û serxwebûnê têk bişkênin, divîya çend sed salan lihember kurdan şerekê bê eman bikin. Lê ji gewahên dîrokê derdikeve holê, ku bi rexma fetha cografyaya wan her dîsan neşîyan ruhê azahîperwerê kurdan bikujin.

Çawan ku di malikeka sirûda nîştimanî ya kurdan Ey Reqîb de dibêje: Ey Reqîb kurd her zîndû we! Di vê nivîsarê de emê bala xwe bidîne saloxên ku Walter Keating Kelly, di pirtûka xwe ya bi navê Syria and the Holy Land [Sûrîye û Erdê Pîroz] de, ku di sala 1844an de li Londonê çap bûye, liser kurdan vegêrraye. Di beşa IVan ya vê pirtûkê de kurdan bi hûrgilî şirove dike û anekdotekê liser rojên dûmahîkê yên mîrnişînên kurd li Împaratorîya Osmanî vedigêrre. Di dema vê rûdanê de, mîrnişînên Bedlîs, Colemêrg, Botan, Behdînan û Soranê (Rewanduz) ji mêj ve hatibûn ji nav birin û niha dora mîrnişîna Baban bû, ku bikeve bin kontrola hegemonê Astanayê. Li vir ya baştir ew e, ku mirov bihêle Kelly bi zimanê xwe saloxetên kurdan bike: "Bi rexma rewendîbûna xwe, kurd miletek in xwedanê mêrxasîyeka serkêş; ji zarotîya xwe de fêrî bikaranîna çek û swarîbûnê ne."

Kelly: Dîrokê ti nimûneyeka wisa ya nîştimanerwerîyê wekî ya vî miletî bo me venegêrraye; ne ti serbazî û ne ti serekî, ne ti yûnanîyî û ne ti romanî, bi qasî vî gelê barbar, mînaka berxwedaneka qehremanane nîşanî me nedaye.

Rûbirûbûna Osmanî û kurdan

Liser rûbirûbûna kurd û dewlet alî Osman, Kelly wiha pêde diçe: "Di sala 1837an de hêzeka tirk şiya serekekê dijwar ê kurdan esîr bigire. Jîyê wî negehîştibû sîhî; bejn û bala wî bilind û zirav bû; kurdekê wisa bedew ticarî neketibû destê osmanlîyan. Serekê xort birin hizûra Hafiz Paşa. Heger ev xort wezîr bûya jî, generalê hêzên Sultan dê muameleyeka wisa bi serinc û qedirdêr nedayê. Hafiz paşa û Qadîyê wî her cure fend û fûtên qanekirinê bi kar anîn da ev serekê xort zanîyarîyan liser liv û bizavên kurdan û delîve û îmkanên wan bide dest dijminên xwe. Sereskerê tirk tenanet wisa bi ser de çû ku soz da heger serekê xort yê kurd bersiva pirsan bi dirustî bide, dê wî bike serhengê tuxayeka osmanî.

Lê kurdê esîr lê vegerand û got "Hûn xelet in, Paşa," û wiha lê zêde kir, "Heger we jîwerî hûn dê di min de begekê din yê Rewanduzê peyda bikin, hûn xelet in. Ez carekê serekekê kurdan bûn, ji bilî serekîya kurdan, ez serekîya ti gurûh û miletekê din nakim. Roja ku te ez kirim serekê tuxaya xwe, karê ewil yê ku ez bikim dê ew be, ku ez pişta xwe bizivirînim, berê çeka xwe bidim serê te. Xwedê teala şahidê min be, ez ne xiyanetkar im. Herçî liser sirr û razên ku hûn hêvî dikin ji devê min bikêşin, hemet bin ji devê min dernakeve, hûnê negihên meqseda xwe. Qeza û qederê ez êxsîr avêtime nav destên hewe, evca hûn çi li min dikin bikin."

Hafiz Paşa ji bikaranîna rê û rêbazên nerm bêhêvî dibe û penaha xwe dibe şkenceyê. Ewilî esîrê xwe bi wergirtina pêncsed derbên xerezanan di binê pêyên ceza dike. Pişta kurdê şêrdil li erdî bû û lingê wî li hewa û mucrîyê cezayî derbên giran li binê piyan dida, ku pê lê kiribûn parçeparçe. Di wê hînê de egîtê kurd bêxem daxwaza qelûnê kir. Serê xwe rakir danî bin serê xwe, qelûna xwe ser hemdê xwe têr kêşa. Bêxemî û aramîya xortê kurd wisa cellad di heyrê de hêlabû, ku matmayî ji bîr kiribûn xerezana li binê piyê wî din. Lê şkenceya bêeman dîsan dest pê kir û heta du rojan kêşa, bêyî ku bikarin peyvekê ji devê vî kurdî derêxin. Roja sêyem kurdê neşkênbar rût û tazî kirin û kirine nav sîtileka avê de û kuçikek agir di bin sîtilê de vêxistin. Heman pirsyar ji gencê kurd kirin, lê kelîmeyeke jî ji devê mêrxasê kurd nefûrî.

"Ka tu çima bersiva min nadî?" Hafiz Paşa gotê û jê pirsî: "qey tu dengê min nabihîzî?"

Serekê kurd serê xwe rakir û req û hişk li derûdora xwe li dijminên xwe temaşe kir û bi aramî lê ziviran: "Şukur ji xwedê re, guhê min hîn kerr nebûye, lê xwedê hez ke, zimanê min ji pirsê we re lal e."

Di vê navê de Qadî ji Seresker pirsî: "Ma ti şkenceyên xurttir tune, em vî kabirayî bidin axaftinê?"

Derbirrîneka dijwar ya nefretê serûsîmayê êxsîrê şkencedîtî girt gava ku got: "ti şkence," û bi dengekê bilind amajayî zelamekê lihember xwe kir, "ti şkence bo min bi azartir nîne, ji wê ku ez liber çavê xwe kurdekê namerd dibînim, brayên xwe terikandîye û ketîye nav refên dijminê xwe!"

Kurdê ku behsa exsîr îşaretî wî kiribû, peşîmanîyeka nişkêve pê girt, demançeyek ji ber kemera xwe kêşa, lûla wê xiste devê xwe û mejîyê xwe peqand. Serekê ciwan ê kurd di nava ava kela sîtilê de hate kelandin û piştî kêlîyekê ruh da.

Liser vê rûdanê Kelly wiha pêde diçe "dîrokê ti nimûneyeka wisa ya nîştimanerwerîyê wekî vê bo me venegêrraye; ne ti serbazî û ne ti serekî, ne ti yûnanîyî û ne ti romanî, bi qasî vî barbarê ciwan, ku em dê çicarî navê wî jî nezanîn, nimûneyeka berxwedana qehremanane nîşan nedaye."

Liser kurdan Kelly radigihîne, ku "kurd jibo azadîya xwe pir xesîs in. Tebeebûna wan jibo Astanê bi tenê bi nav e, xeraca ku kurd didine paşa û walîyên osmanî bêqîmet e. Di navbera kurd û tirkan de dijminatîyeka siruştî heye, çunkû tirk bêsiza xalî xerez kengê dilê wan bixwaze bi kurdan re bedreftarîyê dikin û bi dilê xwe kurdan dikujin, bêyî ku bihêne ceza kirin.

Herçî krîstîyan in, ji alîyê kurdan ve bêhtir dihêne favorîze kirin û berovajî osmanlîyan dikarin bê teşqele di ewlehîyê de di nav kurdan de rêwîtîya xwe bidomînin.

Çavkanî

Keating Kelly, Walter. (1844). Syria and the Holy Land: Their Scenery and Their People. London: Chapman & Hall.



Hafiz Paşa ji bikaranîna rê û rêbazên nerm bêhêvî dibe û penaha xwe dibe şkenceyê. Ewilî esîrê xwe bi wergirtina pêncsed derbên xerezanan di binê pêyan ceza dike. Pişta kurdê şêrdil li erdî bû û lingê wî li hewa û mucrîyê cezayî derbên giran li binê piyan dida, ku pê lê kiribûn parçeparçe.

MÊVANPERWERÎYA KURDAN

Roja şerê Nizîbê, ku Îbrahîm Paşa hêzên Sultan şkandin, çîyayên derûdorê hemû bi swarên kurd mişt bûbûn. Bêsebir li encama şer dinihêrtin, ka kî dê di şerî de bişkê, biçin wan talan bikin. Jiber ku dizanîbûn hêzên Sultan bi quwet û mişe ne, ewilî parra pey spahê misrî ketibûn, lê gava ku dîtin tirk wanê bin dikevin, hemîya ajotine ser yên şkestî û hemî şêlandin. Lê, ya ecêba nedîtî û lihevnegirtî! Heman eskerên ku bêrehmane hatibûn talan kirin, êvarê heman rojê xwe di bin konê talankerê xwe de dîtin û bûne mêvanperwerîya heman talankeran, ku çend seetan berê ew şêlandibûn! Wê gavê heman talanker bi sexawet û camêrî mêvandarîya eskerên talankiribûn, kirin!

Li ser vê mêvanperwerîya kurdan Kelly radigihîne, ku "mêvanperwerî fezîleta bala ya vî qewmê rewend e, û kurdan ev mêvanperwerîya birîye lûtkeya kemalê. Xelkê xerîb, xelkê rêwî, evca ji kîjan dînî be ji kîjan miletî be bila bibe, dê li mala kurdekî rastî bixêrhatineka sadiqane û ji dil bihêt. Kîjan konê, ku xelkê xerî çû ber hêşîya wê dê jêre bibe star û penah, bêyî ku ti metirsîyek liser canê wî hebe. Li mala mazûvanê xwe ti sînor jibo merîfet û tewecuha ku lê dihête kirin, nîne. Gava gihîşt ber stûna konê reş, jina malê dê şelbikek şîr bidine destî, destî û piyên wî bi destê xwe bişon, wî danîn ser doşekên jorê ber stêrr û berî ku xwareka malê hazir be, dê pêxwarinekê bidine ber, da heta hingê birsî nemîne. "

Liser hêminahîya Kurdistanê Kelly dibêje "plana herî ewle jibo rêvingekî, xasma ewropîyekî, ku bi niyet e li welatê kurdan derbas bibe, ew e, bi kû de diçe bila biçe, lê bila bi tenê bêyî pasewan û zêrevan rêvingîya xwe gund bi gund bike, bila ji mazûvanê xwe ewle be, ku dê wî sax û silamet radestî mazûvanê gundê dî biket."

Reşnivîsek li ser sînemayê

SALÎH SULEYMANÎ

PIŞTÎ ku akademîyek mezin ava bû, karekê sereke yê din dest pê dike, organîzekirina festîvalek navneteweyî û kalîte. Jixwe yan tu bi fîlman diçî festîvalan yan jî tu bi festîvalan fîlman tînî cem xwe. Lewre ji 40 mîlyon kurd re festîvalek mezin ferz e. Wisa ne em bi hev re bêjin; serê salê binê salê, Xwedê tu akademî û festîvalek qenc bidî vê malê.

Tevî ku sînemayê aniha, rêwîtîya sedsalîya xwe temam kiribe jî, hin neteweyên mezin ên cîhanê hêj jî ji sînema û hêza sînemayê bêpar mane. Li gelek welatan sînema ji roja ewil pêve geş bû û ket ser rêya milî û ji karekterê wî neteweyî hin ekolên nû derxistin. Îro li cîhanê em dikarin gelek mînakên miletên serdestên sînemayê bidin ku ji xwe re sînemayeka neteweyî ava kirine. Ne avabûna sînemayeka milî, em kurd hêj jî bandor û grîngîya sînemayê nizanin.

Rewşa kurdan

Salên 90î rojekê Behman Qubadî diçe cem Mam Celal behsa sînemayê dike, jê re dibêje zêdetir piştgirîya sînemageran bikin, çimkî her derhênerek bo Kurdistanê dîplomatek e, qada cîhanê bi sînemayê ve propaganda û dîplomasîya kurdan dimeşîne. Wekî van camêran jî qal kirîye sînema hêzeka mezin a cîhana modern e. Cihûyên cîhanê qêrîyan barîyan bona holokasta li Almanyayê û Şerê Duyem ê Cîhanê bînin ziman û bidin qebûl kirin, lê belê ti kesî bawer nedikir. Piştî çend fîlmên wekî Schindler's List, La Vita e Bella kişandin her kesî bihîst ku li rûyê dinyayê cihû qetil bûne.

Mîna wî derhênerî, min jî derfet dît ku li civîna Enqerê ji cenabê serokê Başûrê Kurdistanê Mesûd Barzanî re bêjim, "Sînemagerên kurd bêxwedî ne û ji kerema xwe pişta sînemageran bernedin, tenê mehêlin, çimkî qadeka dijwar û girîng e. Ger hûn îro li rûyê xaka rindik a Kurdistanê perestgehekê çêkin menzîla wê hezar kîlometre ye, ger hûn dibistanekê çêkin menzîla wê 10 hezar kîlometre ye, lê ger hûn fîlmekê çêkin menzîla wê 100 hezar kîlometre ye, û dê dengê kurd û Kurdistanê belavî hemû cîhanê bike." Sînema çeka herî modern a vî zemanî ye, lê lazim e mirov bikare wê çekê baş bixebitîne.



Aniha derbarê kurdan de tişta herî kêfxweş bihête nav birin, herî ewil ew e ku şervanên kurdan ên li çar perçê welêt li enîya şer têdikoşin û serkeftinên wan leşkerî ne, ya duyem jî teqez sînemaya kurdan e.

Aniha derbarê kurdan de tişta herî kêfxweş were nav birin, ya herî ewil ew e ku şervanên kurdan ên li çar perçê welêt li enîya şer têdikoşin û serkeftinên wan leşkerî ne, ya duyem jî teqez sînemaya kurdan e. Tevî hemû tengasî û kêmasîyan sînemaya kurd anegorî wan cureyên hunerê yên din, hewl dide ku xwe ava bike, xwe karekterîze bike. Dema mirov ber ya cîhanê bixe kêm be jî, gorî wan cureyên din, sînema cila xwe ji avê derdixe. Gelek derhênerên kurd ên serkeftî hene û fîlmên baş çê kirine û çê dikin. Ji deverên Kurdistanê bi dehan navên xweîspatkirî hene û wekî karker û xebatkarên doza mezin a miletê kurd dişuxulin. Bi taybetî li Rojhilat û li Bakur sînemagerên hêja hene li festîvalên navdewletî de jî xelatên baş distînin. Lewre ez dikarim aniha bi serbilindî bêjim ku fîlmografîya me îdare dike, lê pêwîst e zêdetir pêş keve.

Sînemaya neteweyî

Îja em werin ser mesela sînemaya neteweyî. Erê, îro sînemaya kurdan heye, lêbelê hîn jî sînemaya milî ya kurdan tune, tam nekemilîye. Li gorî pîvangên akademîk û sînematografîk û estetîk, bona ku sînemayek an jî fîlmek bibe neteweyî û kurdmalî, mîna trîpota kamerayê 3 xalên sereke yên fîlmê jêveneger in. Yek derhêner kurd be, du mijar kurd bin, sê ziman kurdî be. Eger yek ji van xalan kêm be, ew fîlm dibe milkê kurdan lê belê nabe fîlmekê milî. Îro li cîhanê fîlmê kurdan herî zêde deng vedaye ê Behman Qubadî, Kosî Jî Dikarin Bifirin e, çimkî derhêner jî, mijar jî ziman jî kurdî ye. Yilmaz Guney kurd e, lê belê ne milî ye, çimkî zimanê wî tirkî ye.

Gorî min ger ev 3 xal pevre nebin, berhemek, fîlm û belgefîlmek nabe milî. Ger dehêner û ziman kurdî be lê mijar ne kurd bin gorî min dîsa jî nabe milî. Kurdek bi kurdî jîyana berberîyên Efrîkayê bikêşe, yan jî latînên Amerîkayê tomar bike, ev fîlm çiqas kalîte be jî nabe milî, bi ya min. Yan jî kesekê ne kurd, bi kurdî mijareka kurdan bike fîlm ew fîlm dîsa nabe fîlmekê milî. Ji gelek netewan re milîbûn ewqas ne girîng e, lêbelê ji me re milîbûn mîna nan û avê pêwîst e û em ancax wisa dikarin welatê xwe û miletê xwe rizgar bikin. Heta ku em kameraya xwe liser van 3 pêyan daneynin, em nikarin berê kameraya xwe bizivirînin cîhanê. Îro em dibînin ku jiber mercên aborî, gelek derhêner û sînemagerên kurd fîlman bi zimanê bîyanî çê dikin. Ev yek hinekî dihête femkirin lê dîsa jî divê fîlmên xwe yên herî baş bi zimanê xwe çêkin. Dibe ku kurdên me yên enternasyonel bêjin fetîşîzma milîbûnê zirarê dide me, lê em nivşekê bêşans in, em mejbûr in bi vî alî binêrin.

Aniha derbarê kurdan de tişta herî kêfxweş bihête nav birin, herî ewil ew e ku şervanên kurdan ên li çar perçê welêt li enîya şer têdikoşin û serkeftinên wan leşkerî ne, ya duyem jî teqez sînemaya kurdan e.

ÇI PÊWÎST E?

Ev yek helbet bi gotin û temenîyan pêk nahêt. Lazim e kesên bi sînemayê re têkildar, bona ku sînemayeka netewî liser her sê pîyên neteweyî (derhêner-ziman-mijar) ava be, bingehina amade bikin. Bi dîtina min bingeheka xurt girêdayî van her sê xalên sereke ne. Derhênerên baş, fîlmên baş, festîvalên baş. Eger derfetên min hebûna, min ê sazîyek akademîk wekî enstîtuyekê ava bikira, bi ezmûn û mulaqatan xwendekar bigirtana akademîyê û daku wekî ekola Lodz a Polonyayê, wekî Akademîya Huner û Zanyarîyên Sînemayê ya Amerîkayê û hin mînakên li Ewropa, kesên hêja têde pêş ketana. Piştî ku akademîyeka mezin ava bû, karekê sereke yê din dest dê pê bikira, organîzekirina festîvaleka navneteweyî û bi kalîte. Jixwe yan tu bi fîlman diçî festîvalan yan jî tu bi festîvalan, fîlman tînî cem xwe. Lewre ji 40 mîlyon kurd re festîvaleka mezin ferz e. Îro sînemaya fransî bi saya Cannesê, ya Almanya bi saya Festîvala Berlînê zêdetir qedir dibîne. Wekî van festîvalan bi dehan mînak hene ku ez dikarim bidim.

Eger îro derfet hebûya, bona avakirina akademîyê jî, festîvalekê jî, karîzma bajarê Wanê pirr baş e, lê mixabin Bakur niha ji berê zêdetir bindest e, ev yek aniha ne mumkun e. Di vê meselê de barê herî gran dikeve ser milê Hikûmeta Herêma Kurdistanê. Divê ji çar perçeyên welêt, sînemager û akademîsyenan bîne cem hev û li akademîyê îstîxdam bike, bi destê wan kesan jî vê festîvala mezin û xeyalî lidar bixin. Li akademîyê tu dikarî her tiştî fêr bikî, jixwe aniha her sînemager bi derfetên xwe ve kar dike û mixabin gelek ji wan zimanên bîyanî wekî Îngilîzî û Fransî nizanin.

Ez çûm zankoya Selahedîn min Beşa Sînemayê zîyaret kir, ew der jî wekî hemû fakulteyên zanîngehên Başûr ji hemûyên Rojhilata Navîn xerabtir e. Li cîhekê wekî Hewlêrê, akademîyek ji 100 kesî pêk were zêde biha jî nabe. Hemû sînemagerên ji çar perçeyan dikarin li wir ders bidin û dikarin xwendekarên hêja peyda bikin. Ger ev akademî xweser be û em dikarin Dibistana Fîlman a Lodz jî mînak bigirin. Çimkî Roman Polanski, Andrzej Wajda, Krzysztof Kieslowski ji wir derketin. Bo me jî mumkun e.

FIRAT CEWERÎ

Birîna min

Min heta niha dilê xwe ji kesî re venekiriye, sira xwe nedaye der û birîna xwe nîşanî kesî nedaye. Lê min di her firsendê de gotiye, ez yek ji wan kesên bi şans im ku nehatime girtin û di îşkenceyên giran re nebuhurîme. Ji nifşê min ên ku nehatibin girtin û îşkence nedîtibin pir kêm in. Gelek ji dost û hevalên min demên dirêj di girtîgehan de mane û îşkenceyên giran dîtine. Ew bi cîhana derve re rûbiken bin jî, di agirê hundirê xwe de dişewitin. Ew carina bi qerf behsa îşkenceyên xwe bikin jî, ji nişkê ve ewrekî xemgîniyê xwe berdide ser wan û ew kenên wan tavilê li wan dibe girî. Ew di hundirê traumayên mezin de ne. Digel ku gelekan ji wan ji xwe re rê û metodên şexsî peyda kiribin û bi salan bi traumayên xwe re xebitî bin jî, lê her ku ew di nav salan re diçin, bîranînên wan li wan zindîtir dibin û wan di nav xemgîniyê de vedigevizînin.

Sira ku ez ê niha ji we re eşkere bikim, ne salên min ên girtîgehê, ne jî îşkenceyên ku li min hatine kirin in; na, lê şûna du kêrên xedar in.

Her cara ku ez xwe tazî li hemberî neynikê dibînim, ez bi şûna kêrên di laşê xwe de dihesim. Ew kêrên ku li nêzîkî dilê min ketine û du birîn di laşê min de vekirine, ev sih û heft sal in bi min re dijîn. Berî bi sih û heft salan, ez hê xortekî nûhatî bûm, an jî xortikekî naşî bûm. Hê rih û simbêlên min derneketibûn, lê ez dîsa jî bi hewesa şoreşê ketibûm.

Di wan salan de riya min bi bajarekî Tirkiyê yê bi navê Turgutluyê ketibû. Ez û hin xortên MHPyî hatin hemberî hev û me minaqeşeyeke germ li dar xist. Piştî bi demekê minaqeşeya me derbasî xirecir û pevçûna devkî bû. Gava bû şev û tarî ket erdê, wan xortan riya min birrîn û bi kêran derketin pêşiya min. Piştî du kêran ez deverû ketim xwarê. Welê xuya bû ku armanca wan kuştina min bû. Gava wan dît ku ez ketime û li erdê dirêj bûme, tavilê dev ji min berdan, baz dan û çûn.

Ez piştî demeke dirêj, bi birînên giran, bi zorê ji erdê rabûm. Roja piştî wê, êşê li min girantir kir, lê dîsa jî neçûm nexweşxanê. Ez hefeteyekê li erdê mam û bi rojan bi wê êşê jiyam. Êşa laşî piştî demekê kewiyabe jî, ez bi salan ji êşa ruhî xelas nebûm.

Sih û heft sal di ser darbeyên herdu kêran re bihurîne. Min salên naşîtî û xortaniyê li dû xwe hiştine û li gora temenê vê serdemê ez bi ser navsaliyê jî ketime. Lê şûnên herdu kêran mane, winda nebûne û mîna ku te du fasûliyên hişk li ser kêlekê tê de çikandibin, xuya dikin. Gava kurê min ê pêşî ku niha 24 salî ye, nuh bi ser lingan ketibû û dest bi peyvê kiribû, rojekê tilîka xwe ber bi şûnên herdu kêran ve dirêj kir û bi meraq ji min pirsî:

- Ew çi ye bavo?
- Şûnên kêran in, kurê min, min gotibû
-Na, tu derewan dikî.

Di zimanê swêdî de gotina "derew" ne wek ya me giran e, carina dikare were maneya "henek" jî. Min ji kurê xwe re behsa ferqa henek û derewan kiribû, lê ya rastî, min jê re ne henek, ne jî derew kiribû. Gava ew mezintir bû, temenê wî gihişt dehan, wî di firsendeke din de dîsa birînên min meraq kir û min dîsa eynî bersiv dayê;

- Şûnên kêran in, kurê min.

Kurê min vê carê keniya û bi henek li min vegerand:

- Tu henekan dikî, baba, tu dixwazî xwe mîna Herkules nîşan bidî.

Hingî min û kurê xwe bi hev re fîlmek li ser jiyana Herkules dîtibû. Herkulesê ku di şer û pevçûnan de bû, ji gelek deverên xwe birîndar dibû.

Dem bihurî. Kurê min ê pêşî mezin bû. Kurekî min ê din çêbû. Gava ew hat temenê kurê min ê yekemîn, wî jî mîna birayê xwe eynî pirs ji min kir û min eynî bersiv dayê. Îro herdu kurên min nizanibin ku kê ew kêr li min xistibin jî, dizanin ku ew birînên nêzîkî dilê min şûnên kêran in.

Niha herdu kur bi firê ketine, lê xwişkeka wan ya heşt salî heye. Wê heta niha birîna min meraq nekiriye, heke ew rojekê tilîka xwe deyne ser birîna min û bibêje:

- Ev çi ye bavo?

Ez ê eynî bersivê bidimê:

- Şûnên kêran in, keça min.

Ez nizanim wê keça min çawa pêşwaziya bersiva min bike, lê ez dizanim êşa şûnên herdu kêrên nêzîkî dilê min ne mîna êşên hundirîn ên hevalên min in. Êşa laş û ya ruh ne wek hev in; êşa laş şopekê li dû xwe bihêle jî, birînên ruh xedar in, cebirandin û kewandina wan zehmettir e.

Ez nizanim, belkî ya min jî ji birîneke laşî wêdetir bûbe ya ruhî, loma ew bi min re dijî û min heta niha ew ji bîr nekiriye ...

NA DINYA RA YEW MALCOLM DERBAZ BI

■ MIRAZ BABIJ

Wexto ke mi zana ke ez yew kurd a, yanê demo ke mi de hişmendîya kurdîtî awan bîy, mi heme mezlumê dinyayî sey kurdana vînayên. Na çarçewa de mi waşt ke heme "kurdanê" cîhanî nas bikera û mi verê xo kerd ver bi mezlumanê cîhanî.

O wext, kitabroşan de kartpostalî ameyêne rotene: Yilmaz Guney, Che Guevara, Denîz Gezmîş ûsn. rojêk ez ewnîyaya ke refê kartpostalan de yew merdimêko "xerîb" esto, Malcolm X. Bala mi ante û mî o kartpostal herîna...

"Nîjadperestî yew îdeolojî nîya, nêweşîyêka pîsîkolojîk a."

Semedo ke mi nîjadperestan ra hesnêkerdên nuşteyo ke nê kartpostalî ser o bi zaf weşê mi şî bi. Dima mi waşt ke ez heyatê nê camêrdî bimusa.

Serra 1925î de Amerîka de maya xora beno. Hema ke panc serreyî yo pîyê ci kişîyeno. Badê mergê pêrdê ci maya Malcolmî zî bena xînte û kewena nêweşxane. Domanîya Malcolmî bi feqîrî ravîyarêna û badê domanîya xo seba kê dizdîye keno 1946 de keweno hepis. Serranê hepisî de hereketê Elîyah Muhammedî ra xeberdar beno û 1952 de hepis ra vejîyeno û beno endamê nê hereketî. Semedo ke xetîbêko biheyecan o, nê hereketî mîyan de sewîyeya ci bena berze û beno temsîlkarê hereketî.(Nation of Islam)

Dima semedê tayê problemanê îtîqadîyan serra 1964î de Nation of Islam ra abirêno. Xo tim sey Misliman name keno labelê hereketê Elîjah (Elîyah) Muhammedî ey rê zaf wişk yeno. 1964 de vejîyeno teberê Amerîka û sey Erebîstanê Seûdî, Afrîka, Fransa welatan ra gêrêno û sey aktîvîstê heqanê însanan agêreno Amerîka. Hinî goreyê ey; Amerîka seba ke problemanê sîyayîyan hal biko ganî Îslamî nas bikero. Çunke Îslamî de biratîya heme miletanê cîhanî esta. Tabî seba nê biratî heqanê xo ra fek nêveradano. Derheqê nê meselayan de wina vano: "Eke yew heq zewbîna merdiman rê helal labelê şima rê heram bo, weş bizanê ke o dîn, dînê homayî nîyo, dînê kolonyalîstanê şima yo."

Malcolmî zî sey heme sîyayîyan, zulm û zorê kolonyalîstan vînabi û waştêne ke miletê xo na bindestîye ra bixelisno. Wexto ke endamê terîqetê Elîyah Muhammedî bi medya de zaf ca girewtên û zaf sempatîk ameyê mojnayîş labelê nê terîqetî ra abiryayîşî ra dima medya zaf ca nêda ci, eke ca da zî o sey merdimêko xirab lanse kerd. Semedo ke na rewşe zî fam kerdbî, konferansênê xo de wina vatên: "Eke şima zaf baldar nêbê, rojnameyî benê wesîle ke şima mezluman ra nefret bikerê û zulmkaran ra hes bikerê."

Her roje heskerdoxê Malcolmî zêde bîyên û terîqetê ci yê verênî nê halî ra qet hes nêkerdên. Terîqetê Elîyah Muhammedî verê, ci da mehkeme ke Malcolm Amerîka ra bierzîyo, dima dest bi tehdîdan kerd. Rojname û kovaranê xo de Malcolm sey munafiq îlan kerd û "qetlê ci kerd wacîb". Labelê Malcolmî mucadeleyê xo ra çîyêk nêkêmeyna, mucadeleyê xo kerd berz. Organîzasyonê Yewîya Afro-Amerîkanan awan kerd, Martin Luther King zîyaret kerd, Partîya Karkeranê Sosyalîstan de konferans û kombîyayişî viraştî ûsn.

Ey zanayê ke eke kes mucadele nêkero çîyêno ke kes qezenc bikero çin o. Derheqê na mesela de ey wina vatên: "Kes şima rê azadî nêdano. Kes şima rê seypêyî, edalet û çîna nêdano. Eke şima bi rastî camêrdî bê şima nê çîyan bi xo gênê. Eke şima rayîrê ci de mergî rê hazir nîyê çekuya "azadî" ferhengê xo ra vejê."

Şeklê mucadeleyê xo zî wina îfade kerdên: "Aştîxwaz bê, kîbar bê, qaydeyan rê îteat bikerê, her kesî rê hurmetkarî bê; labelê wexto ke yew musalatê şima bi ey birusnê mezele."

Goreyê ey, bawerîya dînî û felsefî şexsî bi. Eke her kes bawerîyanê yewbînan rê hurmetkar bîyayên, mabênê însanan de qet problemî çin bî. Qayde eşkera bi; çi çîyê to esto ganî ti tehamul bikerê ke yê merdimanê bînan zî bibo. Bi nê qaydeyî heyatê xo domna û ne neheqî kerd ne zî verada ke kes ey rê neheqî bikero. Ne sipeyî, seba ke sipî bî rindî bî, ne zî sîyayî, seba ke sîya bî xirabî bî. Însanî di hetî bî; însanê başî û însanê xirabî.

Tehtîdanê terîqetê Elîyahî sewîyaya xo berz kerdbî, verê erebeya Malcolmî rê bi bombeyanê hêriş virazeya labelê Malcolm nê hêrişî ra xelisîya. Dima hetkaranê Elîyah Muhammedî ra John Alî (dima bi eşkere ke no merdim ajanê FBI yo) rasterast Malcolm kerd hedef û va: "Keso ke duştê birêz Elîyah Muhammedî bo wa mergê xo bigîrê xo çim."

21ê sibate 1925 de Eywana Audubon ya ke Manhattan de ya, verê konferansî hîrê endamanê Nation of Islamî Malcolm X, bi vîst û yew derbana şehîd kerd. Ma rê zî qiseyê ey mendî: "Goreyê muslumanan ez zaf sekuler a, goreyê ê bînan zaf dîndar... Goreyê mîlîtanan ez zaf fikirnerm a, goreyê fikirnerman zaf mîlîtan..."

Beno ke azadîya sîyayan hewna rew biameyê labelê "zencîyan" musade nêkerd.

"Ma ke erjanê xo nas nêkerê, înan rê wayîr nêvejîyê şar wayîrîye ro înan keno."

Pîr Îlyaso Dêrsimij*

Baba Merdûxê Rûhanî, kovara Gelawêj (çapa Bexdadî) ra neqil keno û vano ke: "Pîr Îlyas, Dêrsimij o. Yew merdimo faziletin û şaîrêdo wayîrê zewqî bî. Bi ziwanê kurdkî û tirkî şîîrî vatêne û yew Dîwan ey ra pey mendo. Pîr Îlyas, peynîya seserra 13. a hîcrî de şîyo rehmet. O Amasya (yew şaristanê Tirkîya yo) de wedarîyayo. (dekerdo tirbe)" Seke zanîyêno seserra 13. a hîcrî, mîyanê serranê 1785 û 1881ê mîladî der a.

(*Çime: Malmîsanij, "Di Şaîrî", Hêvî: Kovara Çandiya Giştî, Hejmar: 6, Tebaxe 1987, r. 112-115)

Pers & Cewab: Hesen Aslan

Kam o?: Hesen, xortêko çêrmûgij o û 23 serreyî yo. Dîyarbekir de, Fakulteyê Tibî yê Unîversîteya Dîcleyî de waneno.

Çirê o?: O, tena wendoxêkê kirmanckî nîyo xebatê ke ziwan û kulturê ma ser o benê, înan zî weş taqîb keno. O bi xo eynî wext de redaktoranê Kovara Ewroyî ra yew o. Bi kilmîye Hesen aktîvîstêkê ziwanê ma yo.

Ma wazenê ge-ge embazanê winasîyan bidê şinasnayîş û derheqê xebatanê kirmanckî de fikrê înan bigîrê. Ma persayî ey zî cewabî dayî.

P: Ma ke ronîyayîşe Grûba Xebate ya Vateyî ra bigîrê û bêrê heta ewro ti manzaraya kirmanckî senî vînenî?

C: Çîyo ke mi ra aseno, rewşa kirmanckî statîke nîya, tim aver kewena. Grûba Vateyî zî wezîfeyê avervistena kirmanckî kena. Ma şenê vajê a bi nê wezîfeyê xo ya manena a lokomotîvê. Bi rayberîya aye xeylî xebatî virazîyayê, ziwanê ma zaf waran de berhemanê xebatanê aye ra fayde vîneno. Mesela, bi standardê Vateyî ya xeylî kitabî nusîyayê û kovarî weşanê xo dewam kenê. Labelê hewna zî ma nêşenê vajê rewşa ziwanê ma rind a. No averkewtiş heta nika hem zaf nîyo hem zî lez nîyo. Çunke heme çîyî hetê de, ziwanê ma wayîrê statuyê nîyo, ziwanê mekteban nîyo, ziwanê bazaran nîyo... Merdimê ma tim mihtacê yewna ziwanî benê. Nimûne, eger ti wazenî şirî mekteban ganî ziwanê fermî bizanî. Nê şertî zî merdimanê ma ziwanê xo ra fîyenê dûrî. Merdimê ke xususen muhîmîya ziwanê xo nêzanê, bi şertanê bînan a, xaseten ê ekonomîkan, verê xo danê yewna ziwan û ziwanê xo belkî tenya keyê xo de bi kokiman a qisey kenê.

P: To gore fealîyet yan zî aktîvîteyê ke derheqê kirmanckî de benê bes ê? Eke bes nîyê ganî hema çi-çi bêrê kerdene?

C: Ez bawer nêkena kes bişo vajo, belê her çî bes o. Ziwanê ma hewna mihtacê xeylî xebatan o. Nimûne, ganî edebîyatê ma de hewna zaf eserî bêrê nuştene, çunke edebîyat zî tesîr keno ziwanê to aver kewo. Nimûneyêna, ganî standardê ziwanê ma tam roşo û sîstem û qaydeyê ci bi temamî bêrê tesbîtkerdene. Nika her kes zano problemêdê cîyayîya dîyalektan esto, eger standardê ziwanî çinêbo her kes ziwanê mintiqa, dewe yan malbata xo tenya nas keno û ê bînan ra cîya keno. Nînan ra teber ganî heme waran de ziwanê ma kar bikero û kirmancan mihtacê ziwananê bînan nêkero.

P: Ti bi xo redaktorê kovara Ewroyî yî. Ti eşkenî tayê naye ra behs bikî? Aye ra teber çi zehmetîyê nê karî estê?

C: Belê, ez zî redaktoranê Ewroyî ra yew a. Hûmara ma ya sifteyêne vejîyê û ma yê amade benê qandê hûmara didine. Ma redaktorê Ewroyî nuşteyanê kovare hetê gramer û raştnuştişê ziwanî ra tedqîq kenê. Wexto ke ma nê karî kenê standardanê kirmanckî gore kenê yanî mesela yew çeku hetê kamî ra nusîyaya wa binusîyo, kamcîn form de ya wa bo, ma ferhengî gore formê ci yê standardî nusenê. No het ra ez şena wendoxan rê bi rehetî vaja Ewro qandê musayîşê ziwanê kurdî yê standardî hetkarîya şima kena. Zehmetîyê nê karî zî estê, beno ke zehmetîya tewr girde a ya ke ganî redaktor xeylî dîqet bikero ke xeletîyê nêkero yan zî xeletîyê ke virazîyayê bikero raştî. Ganî redaktor ziwanî rind bizano çunke nuşteyan de kes raştê heme qaydeyanê ziwanî yeno. Lazim o redaktor termînolojîyê nuşteyî ra haydar bo ke nuşteyî weş fehm bikero û meqsedê nuşteyî gore redakte bikero. Nê zehmetîyê ke mi behs kerdî hetê redaktorî ra yê, nînan ra teber zehmetîyê ke hetê nuşteyî ra virazîyenê zî estê. Mesela, ge ge nuşte fehm nêbeno qaydeyê ziwanî pêro îxlal benê, o nuşte karê redaktorî nemimkun keno.

Hesen Aslan

P: Çimê to de sewîyeya edebîyatê ma senîn a? Ti şênî hetê menfî û musbetî ra nuştişê kirmanckî ser o biney krîtîk bikerî? Ma wazenê nameyê çend eseranê serkewteyan zî to ra bieşnawîme. Bêguman goreyê to.

C: Ez herçend edebîyatî ser o zanaye nîya zî sey yew wendoxî fikiranê xo vaja. Çi heyf ke edebîyatê ma yo nuştekî wayîrê tradîsyonêdê kehanî nîyo, ez bawer kena tesîrê na rewşe nika zaf aseno. Her ke şino aver keweno zî hewna edebîyatê ma de sewîye zaf berze nîya, ez wexto ke eseran wanena nêşena vaja zaf zewq gêna. La bawer kena û hêvî zî kena edebîyatê ma do bireso cayêdo berz. Ez wazena hîrê kitabê ke na game ameyê mi vîrî tewsîye bikera: Beyi Se Bena? (J. Îhsan Espar), Binê Dara Valêre de (Roşan Lezgîn) û Kalaşnîkof (Deniz Gunduz).

P: Derheqê ziwan û kulturê ma de xeyalê to çi yo? Ti bi xo sey aktîvîst û wendoxêk çîyî bi heyecan pawenî?

Ez vana qey nêşena çîyêdo spesîfîk vaja labelê wazena vaja ke ez kitab û filman ra hes kena û xeyalê min o ma rojê hema-hema heme kitab û filman bi kurdî biwanê û temaşe bikerê.

Çarçewaya babeta ma de seba ameye fikir û planê to estê? Xaseten ti warê tehsîlê xo de wazenî çi bikî? Herhal ma eşkenê to ra xizmetê ziwan û kulturî bipawê?

Ez qayîl a wendişê xo temam bikera û biba doktorê. Helbet ez wazena ziwan û kulturê xo ser o eleqeyê xo zî dewam bikera û xizmetê înan bikera.

Tabloyê Sîyasetê Kurdan:

(1)

Partîyê Sîyasî yê Kurdîstanê Vakurî

■ PÊŞAR BEXTEWER

Ma ke tarîxê nuştişê kirmanckî ra ewnenê vînenê ke partî û hereketanê sîyasîyan yê aktuelan ser o nêameyo vindertiş. Helbet partî û hereketanê sîyasîyan ra qestê ma êyê ke yê kurdan ê. Ê zî herçiqas zêde nêbê zî hîna zaf hereket û portreyanê sîyasîyanê ke tarîxê miletê kurdan de rolêko muhîm kay kerdo, derheqê înan de ameyo nuştiş. Heto bîn ra seke ma zanê sey cuya merdimîye cuya dewletan û hereketanê sîyasîyan zî daîm a, çi manaya musbet çi manaya menfî de biba averşîyayîşê înan bê mabeyn dewam keno. Çunke seke ma zanê dewletî û organîzasyonê polîtîkî awanbîyayîşê xo tu rey temam nêkenê. Vurîyayîş sey ruhê heyatî prensîbê înanê bingeyin o. Xora senî ke Herakleîtosî bi seserran verî vato "Çîyo ke nêvurîyeno vurîyayîş bi xo yo"

Tabî yew xusus wa şaş nêro fehm kerdene. Ma nêvanê ke qewimîyayîşê sîyasîye ke kurdan eleqedar kenê yan zî yew di hereketê kurdan ke da-vîst serranê peyênan de tabloyê sîyasî yê kurdan û balansanê Rojhelatê Mîyanên ser o giranîya înan estê, derheqê fealîyetanê înan yê sîyasîyan de xeberî, analîzî ûsn. nêameyê viraştiş. Çîyo ke ma vanê zêde ser o nêameyo vindertiş program û fealîyetê sewbîna hereket û partîyanê sîyasîyan yê kurdan ê. Oxro ke sey zafê wareyanê înan cuya sîyasîye ya kurdan de zî zaftewirîye esta. Baş ke esta zî. Heyat bi xo zafrengin o. Çîyê kurdan; ziwanê înan, bawerîya înan, folklorê înan yan cografyaya înan bi rengo tekane yo ke rengê sîyasetê înan zî bi rengo tekane bibo? Faydeyê zaftewirîye, zafrenginîye, zaffikirîye esto la tekanetîye ra tu faydeyo musbet nêameyo dîyene. Ma kurdî zî sey her miletî ganî wayîrê cîya-cîya rêxistinanê sîyasîyan bibê. Goreyê fikrê mi çîyo ke zerar bido ma kurdan; zaf tewirîya partî û hereketanê ma nîya. Çîyê ke zerar bidê ewro û ameyeyê şarê ma kurdan nê yê; sîyaseto tekane de israr kerdene, hukumranîya erkê xo tesîs kerdene û polîtîkayê ke menfîyetê neteweya kurdan rê xizmet nêkenê. Nê hîrê helwestî kam partî û derûdorê kurdan ra bêrê wa bêrê xelet ê û ganî bi vengo gur bêrê rexne kerdene. Ma nêwazenê mewzûyê nuşteyê xo hîna zêde vila bikerîn. Aye ra bêrê ma derbazê mewzûyê xoyê esasini bibe. Partî û derûdorê sîyasî yê kurdan ke Tirkîya û Kurdîstanê Vakurî de fealîyet kenê înan bi hawayo pêroyî nas bikîme. Gelo Kurdîstanê Vakurî de çend partî û hereketê kurdan estê? Serekê înan kam ê? Meselaya kurdan senî tarîf kenê û seba çareserkerdişê aye pêşnîyazê înan çi yê? Programanê xo de sewbîna çi babetan ser o vindenê? Bêrîn ma cewabê nê persan û hîna vêşî melumatan cêr ra pîya biwanê.

Partîya Sosyalîste ya Kurdîstanî (PSK)

"Nameyê Partîye, Partîya Sosyalîste ya Kurdîstanî ya. (Bi tirkî Kürdistan Sosyalist Partisi) Amblema aye orteyê zemînê sûrî de roşnaya 21 tîrêjin a ke mîyanê aye de nameyê kilmkerde yê partîye nusîyayo. Merkezê Pêroyî yê partîye bi hawayo fermî Anqara de yo. Merkezê fîîlî yê xebatanê partîye Dîyarbekir de yo. Serekê Pêroyî yê partîye Mesud Tek o.

PSK pêserîya mucadeleyê kurdan ya di sey serreyinî ke înan semedê azadî û seyyewbînîye kerdo rê wayîr vejîyena.

Partîye, ekolê sîyasî yê PSK-Özgürlük Yolu (Rayîrê Azadîye) ke 1974 de awan bîyo, mucadeleyê ey yê aştîxwaz, demokratîk û meşruyî şertanê neweyan de domnena."

"Beşê Senînîya PSK û Ferasetê aye yê mucadeleyî" yê programê partîye wina dewam keno; Warê esasî yê mucadeleyê PSKyî Kurdîstanê Vakurî ke daxilê sînoranê Tirkîya yo.

PSK partîyêka azadîxwaz, welatperwer, demokratîk û sosyalîst a. Partîya kedkaran, sinifa mîyanêne, tebaqayanê zeîf û tay ameyeyinan, roşnvîran û heme katmananê ke hetê azadîye û seyyewbînîye kenê ya.

Sey her şarî, heqê şarê kurdî zî esto ke vera zulm û muameleyanê wehşîyan ke xo rê rûmetê merdimîye hedef gênê xoverdayîş biko...PSK çareserkerdişê her tewir probleman de hetê metodanê dîyalog, pêvînayîş û aştîxwazane de ya.... Mucadeleyê xo de wasita û metodanê zelal, sîvîl, demokratik û meşrûyan xebitnena.

PSK çareserkerdişê meselaya kurdan de kamcîn rayîr yan metodî pawena?

No derheq de programê partîye de wina vajîyeno "Semedê Tirkîya sîstemo realîst û mumkun sîsteme federalîzmî yo. Sîstemo federal, awanîya zafnetewe, zafkulturî û zafziwanî yê welatî rê munasîb o. Îmkan dano komelanê etnîkîyan û dînîyan yê mintiqayanê cîya-cîyayan ke bi hawayo aktîf beşdarê îdareyê welatî bibê. Sîstemo federal tena meselaya Kurdîstanî çareser nêkeno, zemîn dano demokrasî ke xo bi terzê beşdarbîyayoxî (katılımcı) û zafhûmarîyoxî (çoğulcu) geş bikero. "

Seke cor ra zî dîyar beno PSK meselaya kurdan sey meseleya Kurdîstanî tarîf kena û metodê federalîzmî sey çare musnena. Semedo ke perspektîfê ma meselaya kurdan a û polîtîkayê ke kurdan reyde eleqedar ê, ma tena ca danê înan. La detayan ra dîyar beno ke PSK demokrasî, standardê huqûqî û cuya sosyale yê Tirkîya rê zî bêeleqe nîya. Na çarçewa de programê fermî yê partîye de standardê huqûq û demokrasîya globalî sey referans dîyenê.

Partîya ke nameyê xo ra zî eşkera beno ke xo rê xeta çepgir û sosyalîste esas girewta, serekê aye Mesut Tek o. Programê xo de her yewê înan sey sernuşteyêk nê meselan ser o fikranê xo û semedê çareserkerdişê înan pêşnîyazanê xo nîşan dana: Meselaya Demokrasîyî, kurdê ke Tirkîya de ciwîyenê, têkilîyê ke sewbîna parçeyanê Kurdîstanî reyde ronîyenê, Kurdîstano Federe û Demokratîk: Amancê sîyasîyî, înşakerdişê ekonomîya neteweyîye, zîret, tanzîmkerdişê cuya xebate, azadîya bawerîye û laîktîye, perwerde û kultur, heqê cinîyan, ciwanî û domanî, weşî û xizmetê sosyalî, ban û bayindirîye, dorûverê tebîî, kurdê ke dîyaspora de manenê, têkilîyê mîyanneteweyî.

Partîya Azadîya Kurdîstanî (PAK)

Partîya Azadîya Kurdîstanî (PAK) 19. 10. 2014 de ronîyaya û Kurdîstanê Vakurî û Tirkîya de çareserkerdîşê meseleya Kurd û ya Kurdîstanî xo rê sey amanc tespît kerdo. Serekê partîye Mistefa Ozçelîk o. Ma programê partîye ra dewam bikê: Nameyê partîye yo kilmkerde PAK o. Amblema partîye zemîno ke rengê xo dano ro sûrîya gule ser o çar pelê ke rengê înan çeqer (zerd), sûr, kesk û sipî yê. Merkezê xo bi hawayo fermî Anqara de yo la fealîyetanê xo Dîyarbekirî ra domnena.

Amancê partîye

PAK, seba heqê qederê xo tayînkerdişî yê neteweya kurdî mucadele keno. Nê heqî sey bi beşdarbîyayîş û wayîrvejîyayîşê heme eqalîyetanê Kurdîstanî, Kurdîstanê Vakurî de heqê dewlete ronayene yê kurdan vîneno. Kurdîstan de amancê ronîyayîşê dewlete, mumkun o ke bi şeklêko seba heqanê tewr qijan mucadele kerdene zî tede federasyono ke di dewletanê seyyewbînan ra awan beno yan zî dewleta konfederale yan zî beno ke sey dewletêka xosere bêro ca. PAK eşkeno şertan bigîro çimanê xo ver û nê şeklanê çareserkerdişî ra yewe bîyaro rojev.

Prensîbê partîye

Çend prensîbê muhîmî ke ma programê partîye ra neqil bikîme nê ye: PAK, bêke dewleta xosere, konfederasyon, otonomi û statuyanê sey nînan bipawo seba ke dezgeyanê komelê Kurdîstanî nika ra awan bikero û averberdişê înan mucadele keno. Bi şîarê "Kurdîstan, hema nika" hereket keno.

PAK, hedefê xoyê ke tesbît kerdê, semedo ke bireso înan mucadeleyê xo de rayîr û metodanê şefaf, sîvîl, demokratîk û meşrûyan esas gêno.

PAK estbîyayîşê xoyê sîyasîyî, goreyê hereketêko sîyasî yê mewcûdî ney, helwest û prensîbê ke ey çareserkerdişê meselaya kurd û ya Kurdîstanî de xo rê sey referans girewtê, bi goreyê înan tayîn keno.

Madeyê bînî ke binê nê sernuşteyî de vîyarenê nîşan danê ke PAK vîzyonê xo bi erjanê komelanê modernan û qaydeyanê demokratik û mîyanneteweyîyan awan keno.

Programê Amancê Demokratîk û Aktuelî

Kesê ke meseleya Kurdî û ya Kurdîstanî ver tewqîf bîyê yan zî ceza girewte, mecbur mendê ke tebere welatî de sey multecîyan biciwîyê, şer bikê, ameyê mexdur kerdene, ganî nîzamnameyê qanûnî û qanûne bingeyinî ke verê agêrayîşê temamê înan akerê û firsend bidê înan ke bieşkê bi hawayo azadane siyaset bikê bêrê viraştene.

Semedo ke meselaya kurdî û ya Kurdîstanî bi rayîr û metodanê sîyasî, seyyewbînî, demokratîk bêrê çaresekerdiş, ganî estena miletê kurdî û heqê ey ê neteweyî bêrê nas kerdene û bigîrîyê binê taahutê qanûn û qanûnê bingeyinî.

Fikir û hedefê partîye yê bînî ke binê sernuşteyê "Kurdîstan de îdare û Cu" de wina rêz benê nê yê: 1) Demokrasî û sazkerdişê dezgehane 2) Polîtîkaya ekonomî, heqê ekonomîk û sosyalî 3) Îdareyê Mehellîyî 4) Perwerde û Kultur 5) Polîtîkaya Mîyanneteweyîye 6) Heq û Azadîyê Cinîyan, 7) Ciwanî, 8) Domanî, kokimî û astengdarî 9) Weşî 10) Problemê Dorûver û germbîyayîşê globali

Programê fermî yê partîye de nînan ra teber sey "Têkilîyê ke sewbîna parçeyanê Kurdîstanî reyde ronîyenê", Kurdê Tirkîya de ciwîyenê û Mucedeleyê Demokrasî", "Kurdê ke Teberê Dîyaspora de Ciwîyenê ser o yeno vindertiş.

Partîya Demokrate ya Kurdîstanî ya Tirkîya (PDK-T)

Amblema Partîya Demokrate ya Kurdîstanî ya Tirkîya (PDK-T), zemînê sipî ser o tîja ke peyê 4 koyanê vewrinan ra vejîyena ya. Merkezê partîye Anqara de yo la sehaya fealîyetanê aye Dîyarbekir o. Serekê Pêroyî yê partîye Mehmed Emîn Kardaş o.

Amancê Partîye

Programê partîye de wina yeno vatiş "... Amancê tewr esasî yê partîya ma, caardişê îradeyê sîyasî yê neteweya kurdî yo. No bi hawayo sîyasî bi federasyon dima ra zî bi xoserîye mumkun o. Travmaya sosyale ke şaro kurd bi serran o binê tesîrê aye de yo, seba ke na travma bivîyarno ganî xo bi pêroyê enstrumananê îdarekerdişî îdare biko. Termînolojîya sîyasetî de manaya nê enstruman fedaralîzm yan zî xoserî ya. Çarçewaya nê amancan de hedefê partîya ma bekê şîdetî bixebitno bi rayîranê meşrû û demokratîkan tesîskerdişê federalîzm û xoserîya ke hedefe şarê kurdî yê.

Sey rayîrêko hîreyîn fikrê xoserîye

Demêk bi fedaralîzmî îdarebîyayîşê kurdan û şaranê Tirkîya ra dima fikrê xoserîye sey rayîrêko 3. do bêro rojev. Ganî kurdî zî sey şaranê bînan yê dinya bieşkayê dewleta xoya xosere ronê. No şaranê Tirkîya rê xayînî nîya, eqsê ci xebitnîyayîşê yew heqî ra îbaret o.

Babeta xoserî girêdayeyê îradeyê şarî yê azadî yo. Yew şaro ke demêk xo bi fedarîlîzmî îdare kerdo, na mana de bîyo wayîrê tecrubeyî, ganî yew mudetî ra pey ey ra pesr bibo ke xoserî wazeno yan nêwazeno? û ganî goreyê bira ke dîyayaya gore bêro hereketkerdiş.

Faydeyê zaftewirîye, zafrenginîye û zaffikirîye esto la tekanetîye ra tu faydeyo musbet nêameyo dîyene. Ma kurdî zî sey her miletî ganî wayîrê cîya-cîya rêxistinanê sîyasîyan bibê. Goreyê fikrê mi çîyo ke zerar bido ma kurdan; zaf tewirîya partî û hereketanê ma nîya...

Çîyê ke zerar bidê kurdan nê yê; sîyaseto tekane de israr kerdene, hukumranîya erkê xo tesîs kerdene û polîtîkayê ke menfîyetê neteweya kurdan rê xizmet nêkenê. Nê, kamcîn derûdorê kurdan ra bêrê wa bêrê xelet ê û ganî bi vengo gur bêrê rexne kerdene.

Mustafa Ozçelik

Mesut Tek

Mehmed Emîn Kardaş

FEXRIYA ADSAY

Bîranîn û serborîyên Şakir Epözdemir

DEMA civakek ji mafê serwerîyê û avakirina sazîyên xwe yên civakî û neteweyî bêpar be, zehmet e di wê civakê de di sîyaset û warê xebatên çandî de karbeşîyek modern çêbibe. çewan sîyasetmedar ji alîyekî ve pêwîst e ronakbîr, dîrokzan, zimanzan û folkornas be, dema bîranînên xwe jî dinivîsînin gelek caran bi qasî serpêhatîyên wan dîrok, çand, ziman û folklor jî tê de cî digre. Jiber tunebûna sazîyên neteweyî her dem dilgranîyek heye ku wê çanda zaroktîya wan bihête ji bîr kirin û bi nigeranîya veguhestina wê tevdigerin. Helbet ev bo me avantajek e ku bi em bi saya wan gelek keresteyên derbarê dîrok, antropolojî, sosyolojî û çanda civakî ya kurdan bi dest bixin. Ya din, bi saya wan em dê bikarin wêneyekê bêhtir giştîgirane ji rabirdûya xwe derxin. Otobîyografîya Şakir Epözdemir Beşek Ji Serpêhatî û Bîranînên Min (Fanos, Enqere, 2011) jî dikare di nav vê çarçoveyê de bê nirxandin.



Epözdemir di sala 1938an de li gundê Minarê yê ser bi Baykana Sêrtê hatîye dinyayê. Heta bîst salîya xwe li gundê xwe jîyaye; piştî serbazîyê li Dîyarbekirê bi cî bûye. Li Dîyarbekirê wî û hevalên xwe di sala 1965a de KDP-T damezrandine.



Şakir Epözdemir kî ye?

Epözdemir di sala 1938an de li gundê Minarê ya bi ser Baykana Sêrtê ve hatîye dinyê. Heta bîst salîya xwe li gundê xwe jîyaye; piştî xizmeta serbazîyê li Dîyarbekirê bi cî bûye. Li Dîyarbekirê wî û hevalên xwe di sala 1965a de Partîya Demokrata Kurdistana Tirkiyê (T-KDP) damezrandine. Di 1968de ew û hevalên xwe dihêne girtin û 13 mehan di girtîgehê de dimînin. Li Bakur cara yekem Epözdemir di vê dawê de berevanîya sîyasî dike. Dema di 1971ê de Said Elçi û Said Kırmıztoprak (Dr. Şivan) dihêne kuştin, dev ji sîyaseta rêxistinî berdide.

Jîyana gundan û îro

Epözdemir bi xwe radigihîne ku yek ji armancên nivîsîna wî nasandina jîyana gundan e. Bi nifşên nû û yên dahatûyê bide zanîn ka ji çi qonaxî hatine çi qonaxî, hay ji werara wan a civakî hebe bi nîyeta ku "ew tiştên tên qeydkirin... hin ji wan bi kêrî mal û malbatekê, hin ji wan bi kêrî gundekî ango bajarekî, hin ji wan bi kêrî şopa sîyasetekê, hin ji wan jî bi kêrî cîhanekê" bên (r.9). Epözdemir bi gelek awayan wêneyekê jîyana gundan pêşkêşî me dike. Wekî nîşaneya jîyana gundan pir bi hûrgilî qala têkilîyên malbatî dike, di nav jîyana rojane de navê gelek mirovan derbas dibe, mirovan bi giştî bi bavê wan, malbat, an eşîra wan nas dike. Xwînerên xwe dixe nav atmosfera jîyana gundan ya dema xwe lê helbet em baş nizanin ka li vir bêjingek çewan bi kar anîye bo bîranînên "hêja"yî neqilkirine hilbijêre. Bi bibîrxistina tenbîyên mezinan, rêzkirina lîstik û xeyalên zarokan, xeberoşk û metelokên zarokan tevî rengên jîyana gund, dihête hest kirin ku Epözdemir hewl dide qismek ji folklora gundê zaroktîya xwe/parçeyek ji çanda kurdî derbasî nifşên nû bike an wan ji jibîrbûnê xilas bike.

Zimanê kurdî û perwerdeya dewletê

Ev pirtûk yek ji otobîyografîyên degmen e, ku bi kurdîya kurmancî hatine nivîsîn. Bi kurdî nivîsîye, ku em xwînerên kurdî baştir nifûzî rihê jîyana nivîskar bikin û ji alîyekê din ve hiştîye nivîskar bi wêneyekê baştir, jîyana xwe nîşanî me bide. Wekî mînak, ger ziman tirkî bûya belkî wê nikaribûya ewqas keresteyên folklorîk neqil bikira. Epözdemir di nav şexsîyetên sîyasî yên naskirî de yek ji wan mirovan e ku kêmtir marûzî perwerdeya dewleta tirk maye. Tenê pênc salan xwandîye. Ji bilî vê jî çend dersên medreseyê xwandîne lê xilas nekirîne. Qasî dihêtê famkirin kêmperwerdebûn, bi saya zîrekîya wî, jêre zêde nebûye asteng, belkî jî bi saya vê tirkîkêmxwandinê karîye otobîyografîya xwe bi kurdî binivîsîne û jîyana kurdewar neqil bike. Li Bakur sîyasetmedarên bêhtir marûzî perwerdeya fermî mane bêhtir ji jîyana kurdewar dûr ketine û kesî ji wan serpêhatîyên xwe bi zimanê kurdî nenivîsîye, ku ev jî yek ji encamên perwerdeya fermî nîşanî me dide.

Epözdemir malbata xwe wekî malmele pênase dike ku pêşîyên wî (wî bixwe jî) medrese xwandine û wiha dewam dike: "Malmeletîya malbata me vê paşîyê zîvirî mamostetîya mekteban. Em ji malmeletîyê şiqitîn hatin bûne mamosteyên komara nedemoqratîk (r.78)" Ev ne tenê guherîna malbata wî ye. Ev pêvajoya guherîna civaka kurd a ji hişmendîya kurdewar ber bi tirkîyeyîbûnê (an tirkbûn) ye jî.

Oto-bêhafize hiştin

Zanyarên liser bîra civakî dixebitin dibêjin, dema civakek tûşî qirkirin û karesatên mezin dihêt, kesên mayî meyla wan bêhtir ber bi jibîrkirinê ve ye. Heta ji destên wan dihêt, serborîyên xwe ditepisînin, naxwazin ji zarokên xwe re qala wan bikin bi nîyeta ku wan ji karesatên nû biparêzin. Ew nifşê ewil ê piştî qirkirinê bi destê dê û bavên xwe bêhafize dihêne hiştin. Belkî mezinên wan jixwe dizanin ku bîra kolektîf parçeyek ji hebûna wan e, nahêle endamên civatê wekî ku ew tunebe tevbigerin. Mirovan dike nav tevgerê. Hêj du nifş bi şûn de endamên civakê wê hêzê di xwe de dibînin li bîra xwe bikolin, êdî nikarin wekî ku ew tunebe tevbigerin. Di nav bîranînên Epözdemir de mînakeka baş heye ku mirovî diêxe nav vê çarçoveyê.

Apê bavê Epözdemir Haci Kamil Efendî li Bidlîsê di salên 1913-14an de bi sedema dijî îtihadgeran piştgirîya Mela Selîm kirîye; ew jî hatîye darvekirin. Keça wî Şefîqe xanim jinapa Epözdemir e. Şefîqe xanim, di dema darvekirina bavê xwe de 16 salî bûye, wê qet behsa darvekirina bavê xwe ji zarokên xwe re nekirîye, gotîye bavê wê di germavê de xeniqîye. Herwiha Epözdemir û kesên din ên malbatê jî bi vê nizanin ango mezinên malbatê dizanin lê nabêjin. Şefîqe xanim heta wefata xwe jî ji kesî re rastî negotîye. Di salên 1990î de vekoler Müfîd Yüksel ji arşîvên osmanî derdixe ku ew di germavê de nexeniqîye, lê hatîye darvekirin.

Epözdemir zêde liser sedemên vê veşartinê nasekine. Em baş nizanin ka Şefîqe xanimê ji tirsa xwe rastî vedişart an di atmosfera serdemê de jiber aqûbeta bavê xwe fedî dikir û di binhişê wê de jibo bibîranînê ne guncayî bû. Lê sedem her çi be, encam oto-bêhafizekirin e, ev rewşa şexsî an malbatî rewşeka tîpîk e ku dikare bo civaka kurd bixwe jî bibe mijara behskirinê. Oto-bêhafizekirina civakan kêm zêde bi vî awayî dimeşe. Dûre rastî çiqas derkevin holê jî qelîştekên di hişmendîya civakê de vebûne êdî nayên girtin, tiştên hatine windakirin gelek in.

Hafizeya serdestan

Ji bîranînên Epözdemir jî dîyar dibe di derdora ew di nav de mezin bûye bîrek derbarê dîroka nêz de zêde tune an ji alîyê mezinên wan, wekî Şefîqe xanimê, ve dihête veşartin. Epözdemir dîyar dike dema li Kütahyayê serbazîya xwe dike serbazên tirk bi heqaret ji serbazên kurd dipirsin "Kurdo ka bêje te çend cendirme kuştine!?" Ew dibêje heta wê çaxê nizanibûye kurdan cendirme kuştine (r.133). Kurdekê ku qet haya wî ji serhildan û qirkirinan tune, yanê bêhafize; li alîyê din tirkên "xwedîhafize". Sal 1958 e; heta vê salê bi rêya wêje, çapamenî, sazîyên din û bîranînên tirkên li Kurdistanê şer kirine hwd. di serê tirkan de îmajeka gelek xirab a kurdan êdî rûniştîye. Kurd ne hay ji wan heye, ne ji xwe! Ma wê çewan hebûya?! Ne tenê ew pirs, tenanet ji ber kurdbûna wî jêre gelek asteng derdixin. Baş e ku Epözdemir bi saya zîrektî û wêrektîya xwe ji bin wan radibe le yên ku nikaribûn rabin, çi bûn gelo!?

Bi qewlî Epözdemir "bindest wekî qirşikên ser avê ne, ba li wan dide û ew jî alî alî ve tên diçin" hafizeyek tune giranîyekê liser wan çêbike daku ba wan her dem nede ber xwe.

Destpêka du xetên cuda di sîyaseta kurd de

Di bîranînên Epözdemir de jibo tesbîtkirina destpêka du xetên cuda yên sîyaseta kurd de hin delîl hene. Ew xeta ku kurd wekî neteweyekî qebûl kirine, çi mela, çi axa, çi gundî, çi şêx be kurd hemû di bin vî banî de bûn û ligor wan doza serwerîyê dikirin. Xeta din, ji dijberîya sîyaseta dewleta serdest zêdetir, din bin bandora vatişên tirk û kemalîst de, di destpêkê de tebeqeya dîndaran û sîstema eşîrtîyê kirin hedefa xwe ku wan rê liber pêşveçûnê digirtin. Sedemên serkeftina ya duyem û têkçûna ya yekem hêjayî nîqaşê ne.

Epözdemir qala mîtinga li Farqînê ya bo petrolê dike. Mîting jiber şertên wê demê bi alikarîya TİPê pêk dihêt. Ligor neqilkirina wî, TİP dibîne ku tişta xelkê dihejîne ne slogana "Karkerno, Gundîno!" ye. Lê dînamîzma gotina "Çîyayê Bîngolê" bi serê xwe meydanê dihejîne. Said Elçi wisa diaxive: "Hûn dev davêjine şêx û axan, ka bêjin niha dewletê li ku fabrîqeyek vekirîye û şêx û axan ew fabrîqe kilît kirine. Ev ne meseleya şêx, axa, karker û gundîyan e. Ev pirs pirsa zîhnîyeta dewletê ye. Dewlet wekî welatîyên xwe li herêma Kurdan mêze nake. Dewlet herêma me wekî welatê xwe yê esîl napejirîne. Dewlet ferq û meylê dike û bi çavê kurê jinbavê li Kurdan mêze dike ." Gotinên ku di wê mîtingê de herî zêdetir bandor kirîye ev bûne. Piştî wê Elçî bo Kutahyayê dihête sirgunkirin.

Bîranîneka din jî liser Dr. Tarik Zîya Ekinci ye. Botîyên li Dîyarbekirê di sala 1963ya de dixwazin komeleyekê ser navê Botan ava bikin. Li qehwexaneyekê civînekê çêdikin ku ji fabrîkator heta karker û melayan ji hemû tebeqeyan kes beşdar bûne. Yek ji wan Tarik Zîya Ekinci ye. Ekinci bi axaftinên xwe yî di nav çarçoveya marksîzmê de civînê sabote dike; him komele nayê avakirin him dilê gelek kesan jixwe dihêle. Di heman salê de Ekinci dibe talibê şaredarîya Dîyarbekirê lê ligor Epözdemir, ew jiber helwesta xwe ya çep winda dike. Xwazi Epözdemir bêhtir qala hûrgilîyên wê civînê û atmosfera giştî ya fikrî ya wê demê bikira.

Kuştina du Seîdan û dawîya sîyaseta rêxistinî

Epözdemir di vê pirtûkê de di 1971ê de, sala ku xwe ji sîyaseta rêxistinî vedikşîne, sekinîye. Ev sal sala kuştina Said Elçi û Dr. Said Kirmizitoprak e jî. Ev bûyera ku hê jî ji bîranînên wê demê wêdetir bi ti belgeyên fermî nehatîye îzeh kirin û zelal kirin, yek ji encamên gelek alozîyên sîyaseta kurd e ligor em ji bîranînên Epözdemir fam dikin: xebata bêprensîb, di nav xwe de neşefaf, bêbingeh ku gelek caran insîyatîfên şexsî berê rêxistinan tayin kirîye an wisa xuya dike. Û helbet rola îstixbaratên dewletên serdest û têkilîyên wan î di nav sîyaseta kurd de ku îro encax dikare bê texmînkirin û kî dizane em ê kengî bi awayekê eşkere bi wan bizanibin. Bi vê bûyerê him du xweşmêrên kurd ji holê hatin rakirin him alozîyên nû bi xwe re anîn. Belkî jî ev bû destpeka têkçûna xeta yekem a di sîyaseta kurd de. Em hêvîdar in Epözdemir di cilda duyem de derbarê piştî pêvajoya vê bûyerê agahîyên bêhtir bi hûrgilî bidin.

Epözdemir dîyar dike dema li Kütahyayê leşkerîya xwe dike serbazên tirk bi heqaret ji serbazên kurd dipirsin "Kurdo ka bêje te çend cendirme kuştine!?" Ew dibêje heta wê çaxê nizanîbûye kurdan cendirme kuştine (r.133); kurdekê ku qet haya wî ji serhildan û qirkirinan tune; yanê bêhafize; li alîyê din tirkên "xwedîhafize".

Tango med: Di hevkêşeya azadî û ewlehîyê de - i

Her tişt bi azadîyê dest pê dike

CIWANMERD KULEK

25ê Kanûna Paşîn (Rêbendan), piştî nîvro seqemeka dijwar çêdibe. Di du deqeyên ku destê xwe ji berîka xwe derdixim bo ku ji xwe re cîyekî veqetînim di dormîşa bo Dîyarbekirê de, destê min dihêt ku biqerise. Qasek şûn de, gava dormîşa Bismil di nav mijekê re berev Dîyarbekirê diçe berfeka hûrik dest pê dike. Di kuçeyên bêdeng, ji her demê bêdengtir, ên navenda bajêr de li cîyekî digerim ku rûnêm û qehweyeka germ vexwim. Li sikaka ku heta du sê sal berê gelekî şên û qelebalix bû, dikevim cafe-bareka ku hingê me dihêt de cî nedidît ku rûnên. Hundir vikîvala bû. Piştî demeka kin ez ê ji wir biçûma cîyê hevdîtina xwe. Ne dûrî wir bû. Lê dilê min bi tep û rep bû. Ne serwext bûm ku eger wê hewa û seqaya mirî û dilteng a bajêr bi ser wir de jî girtibûya ê sohbeta me rengekê çawa wergirta.

Saet texma 6an ji wê cafeyê rabûm. Berfa qandî tûkekê ser repinên (gîyayên) nava kuçê girtibû sermaya hişk şikandibû û dinya hinekê germtir bûbû. Min berê xwe da cîyê Tango Medê ê li qatê dawî ê avahîyeka heft qatî. Cîyê wê yê berê jêrzemîna Diyar Galeriayê bû; ji binê erdê berev asîmanan: işareteka xweş bû! Di destpêka romana Defterên Perrîdankan (2014) de, rojnamevanekê ku ji Stenbolê dihêt bo ku serdaneka sîyasî a li Dîyarbekir bişopîne û derheqê wê de ji weşaneka bîyanî re binivîse, rojekê rîya wî bi wê avahîya Galeriayê dikeve û li wir bi berpirsîyarê weşanxaneyeka kurdî re hevpeyvînekê dike. Rewş dîsa wiha ne xweş e, mij û dûmana dubendîyan dinya dagir kirîye û weşanxaneya kurdî jiber derfetên xerab ê were girtin. Wê rojê, li wê derê, rojnamevanê me li Tango Medê rast tê, û bi maestroyekê mîna Kemal Ciwan Işık re liser pîyan çend gotinan ji hev re dikin. Dawîyê ev maestro ji lehengê me dixwaze ku dema careka dî hat Amedê teqez were wan jî bibîne. Di rê de xwe wekî wî lehengî his dikim. Ez jî ji Stenbolê hatime û roja berê min bi berpirsîyarên pirtûkxaneyekê (ne weşanxane!) re hevdîtinek kiribû bo rojnameyê. Dîsa ji wê pêjnê xelas nabim ku jîyan piştî edebîyatê dihêt û ez ne nivîskarek im ku tiştên ku dijî dinivîse, lê nivîskarek im ku tiştên ku dinivîse dijî.

Piştî çar salan ev cara yekê bû ez diçûm vê dibistana Tangoyê û Navenda Hunerê a ku Kemal Ciwan Işık û Sevgi Almış bi hev re berî niha bi salan ava kiribûn û hê jî bi rê ve dibin. Mîna li cîyê wan ê berê ê li Diyar Galeriayê, liber derîyê vî cîyê nû jî selikeka galoşên plastîk hebû. Min jî cotek galoşên şînik di ser pêlavan re xistin pê û ketim hundir. Li alîyê çepê ê derîyê hundir refeka tijî pêlavên tangoyê ên Turkuaz, hem jibo jinan hem jibo mêran, cilûbergên dansê jibo jinan, mîna mirov pê li cîhaneka dî dike liber mirov disekinin. Li vê cihana nû, li hêwana ronî û freh a navendê, du remzên nas ji hember de silavê li min dikin: Du portreyên mezin ên du hunermendên jin ên kevn ên kurd bi ser du derîyan ve daliqandî ne û dîyar dikin ku yek jê Salona Leyla Bedirxan yek jê Salona Meryem Xan e. Piştre agehdar dibim ku li salona Leyla Bedirxanê dersên dansê û mîlonga (şevên tangoyê) dihêne li dar xistin û li a Meryemxanê jî –ew jî anegorî navê wê - dersên muzîkê lê dihête dayîn. Helwêst û piştevanîya Tango Medê a ji roja pêşî de bo zimanê kurdî û kultura kurdî di gelek çalakîyên wê de dixuye, herwiha hemû daxuyanî û broşurên wê digel zimanên dî bi zimanê kurdî jî çap dibin. Lê vê dezgehê ti carî xwe ji ruhê tangoyê û axa ku ev dans û kultur lê şîn hatîye û jê belav bûye jî qut nekirîye: wêneyê muzîkjenê efsanewî ê tangoyê Carlos Gardel û Rosita Moreno ê di filmê li Tango Bar (1935)ê de, çarçovekirî, li dîwarê hêwanê hilawistî ye.

"Hunermend li kû ne, çima diçin?"

Di vê dema ku bi raya wî ji her demê bêhtir pêdivî bi huner û hunermendan heye de, Kemal Ciwan nerazî bû ji çûna hunermend û nivîskaran ji bajêr. Her çiqas heq dida halê wan û hurmeta xwe çend caran destnîşan dikir jibo biryara wan jî, bi gazin bû ku di demeka ku herî pirr ihtîyacî bi wan hebû de hunermend terka bajêr dikin, ji Kurdistanê derdikevin. Qebûl dikir ku hin îmkan li vir tine bûn, lê dupat dikir ku ên ku wan îmkanan bi-afrînin jî hunermend in. Dilgiranîya xwe venedişart: "Qey hunermend li ku ew îmkan hebe ê here wir? Jixwe tam jî di vê demê de pêwîst e em liber xwe bidin, ji a xwe danekevin xwarê. Eger em ê bawer bikin ku huner nirxek e, ew dem ev dem e, divê a niha be. Herî pirr vê demê huner ji me re lazim e, eger em di vê demê de jî dev ji her tiştî berdin û herin mirov ê bêhnçikandî bibin, ê xelk wekî zombîyan bigerin. Hem zor û sitema kapîtalîzmê a liser mirovan û pirsgirêkên aborî ên ku mirovan difetisînin, hem alozîyên sîyasî û ewlehî pêdivîya bi zimanê hunerê zêdetir dike."

Kemal Ciwan Işık ne tenê hunermend, hunerhez û rêvebirekê karên kulturî, ew herwiha xemxurekê bajar û welatê ku lê dijî ye û bawer dike ku bajar, kuçe û kolan bi hebûna hunermendan dewlemend û rengîn dibin. Hez dike li kuçeyê li hunermendekê kurd rast bihêt û silavê bidin hev. "Bo nimûne, çiqas xweş e gava carina ez li kuçeyê rastî Şener Özmen têm. Divê huner ti carî raneweste, reha wê neye birrîn û her tim liser axa xwe biherike. Tişta ku hêvî û moralê dide mirovan ev e. Di serdemeka ku her kesî pêdivî bi hêvî û moralê heye de, divê hunermend li vir be, em gişt liba hev bin û hêzê ji hev bigirin." Bi fikar e ku kuçe ji hunerê û hunermendan vala dibin dikevin bin destê kesên zêde polîtîze, xwedî bîr û bawerîyên hişk. Di nav re behs dike ku ji çûna min jî (2014) xemgîn bûye.

Meseleya ku wekî meseleya azadîyê bi nav dike û wê wekî destpêka her tiştî dibîne, bi gotina wî, bêyî ked û xebat û afrandin û axaftina hunermendan nabe. "Jibo hilberandin û afrandineka bi kalîte a di warê çandî û hunerî de azadî xala destpêkê ye. Eger pirsgirêkên hunermendan ên azadîyê hebin jî ji dêvla ku biçin bila werin, em bigihên hev, vana biaxivin û bi dengekê bilind wan bibêjin." Li gor wî, girêka kor li vir e. Eger girêka xirboqî li vir hatibe avêtin ancaq li vir bihête vekirin. Bawer nake ku arîşe û meseleyên ji vir dizên li cîyekê dî bên çareser kirin. Pêşnîyaz dike ku hunermend pêşangehên xwe yên pêşî li vir vekin û hewl bidin ku bajar cardî bibe navendeka cazib bo afrîner û hunermendan. Kêşeya azadîyê a ku ji çaralî de xeleka li dora mirovan teng kirîye, ji gotina pêşî a ku ez bi Kemal re dikim de dibe mijara sohbeta me û ev mesele, li vê şûna ku min di serî de xwastibû tenê werim pirs û behsa tangoyê bikim, maweyeka dirêj me dibe û tîne. Gotineka ku di vê qisetê de liser rewşa hunerê dike, mirov ji binî de dihejîne: "Halê sîyaseta kurdan çi be, halê hunera kurdan jî ew e."

STRANA KU HEŞT SAL IN LÊDIXE



Eger ez bibêjim kêş û hewaya wê derê ez şaş kirim ê kêm bimîne, ya rast, ez hîç ne li bendê bûm. Muzîkên tangoyê ên ku heşt sal in bê navber di bin vî banî de li bajarê Dîyarbekir lêdidin, tevî ku wê gavê ders tine bû jî, li hêwana navendê bi aramî bilind dibûn. Stranên ku çiqas zehmetî û astengî kişandibin jî di heşt salan de carekê jî deng ji wan nebirîyabû û ranewestîyabûn, wekî nîşana jîyanê, berxwedanê û liserpîyan-mayînê bûn di serdemeka wiha de ku sazîyên kultur û hunerî -çi ên ku gelek xebat kiribin çi jî ên ku zêde xebat nekiribin- gelekên wan hatine girtin. Kemalê ku heşt sal berê ji Bodrumê lêxistibû û hatibû vir û Kurdistanê wekî cîyekê ku bi şev dihat mala xwe didît, ji her demê enerjîktir, bixîrettir û bihêvîtir bû. Halê nexweş ê li welêt, şer û perîşanî û derbiderî, zext û zordarî, hemû arîşeyên ku ji her qorzîyê serê xwe derdixistin, çong û qidûmên wî neşikandibûn. Camêrekî ji serî heta pîyan bi hêvî û bi cehd û xebat li hember min bû: "Eger îro ji her rojê zehmettir be, îro ji her rojê bitalûketir be, îro ji do nexweştir, neewletir û nearamtir be, ev dihête wê maneyê ku îro ji her rojê bêhtir pêdivîya me bi hunerê heye," digot, bi dengekê xurt û tijî arezû.

"ROJEKÊ KUÇE Ê DÎSA ŞÊN Û RENGÎN BIBIN"

Lêbelê ev karbidestê xwebexş ê Tango Medê bi hêvî ye, ji dil û can bawer e ku ruhê çêkirin û afrandinê li axa Mezopotamyayê heye, û eger hunermend herin jî, liser milên hunerhezan be jî, ev çerx ê her tim bigere. Bi dupatkirineka zexm dîyar dike ku bi girtina çend sazîyan ê dev ji huner û hilberînê bernedin. Çunkî, bi qenaeta wî, mirovên vir ji berhemanînê hez dikin, jê zewqê digirin. "Gava van kesan şert û mercên baş afrandin kesên li derve jî ê werin. Mîna sûrên ku bi hezar salan liser pîyan mane, huner jî ê berdewam be." Jibo wî referansa herî girîng ew e ku mirovên ku ji vî bajarî, ji vî welatî hez dikin hene. Û ew kes ne tenê li vir in. Li gelek welatên ku gerîyaye li wan rast hatîye. Kesên bi hesreta vir dişewitin, kesên ku kîjan rojê be dixwazin werin vir û kesên ku hêvîya wan ev der e hene! Işık difikire ku "potansîyeleka me yî gelekî mezin a di her warê hunerê de heye. Em bi destê hev bigirin em dikarin gelek tiştan bikin jibo ku hunermend vê potansîyela xwe bi kar bînin."

Çend caran bi dengekê hêlî dîyar dike ku pêdivî bi qadeka sivîl heye, bi cîyekê ku hunermendan bigihîne hev, cîyekê bêyî ku fikr û boçûnek liser wan were ferz kirin hunermend azad bêne hiştin. "Ji xwe re bifikire, hê gelek hunermendên me hevdu nas nakin, haya wan ji hevdu tine." Heta du sal şûn de, gava ketin deh salîya xwe, hêvî û xeyala Işık ew e ku akademîyekê ava bikin ku hemû hunermend têde bi azadî bifikirin û biafrînin. Jibo vê yekê hêvî û daxwaza wî ji karsazan heye ku ew jî bi alîyekî bigirin, destê xwe têxin bin vî barî û cîyekî bidin wan. Vê dezgeha ku di heşt salan de di zêdetirî 20 warên hunerê de perwerdehî daye û hîç nesekinîye, piştgirîyeka mezin ji kesên desthilat heq dike.

Guftûgoya bi vî maestroyê jîr û dilovan re careka dî anî bîra min ku çiqas pêdivîya me pê heye ku em di pencereya huner û hunermendan re jî li jîyana xwe, bajarê xwe û welatê xwe binerin. Nerîn û dîtina me a ku bi gotar û angajmanên sîyasî qels û melûl bûye çiqas hewceyî reng û zimanekê çandî û hunerî ye. Li bajarekê ku her kes kêm-zêde şikestî, birîndar, dilşewitî, bêkêf û bêhêvî maye de Kemal Ciwan Işık bi heyecana rojên pêşî a ku li kuçeyên vî bajarî dans dikir de, bi serfirazî radigihîne ku: "Li dinyayê cîyê herî pirr xwe lê azad his dikim Kurdistan e."

Gavek şûn de em vî beşê yekemîn diqedînin û Kemal radibe diçe Salona Leyla Bedirxan bo dersa tangoyê bide çend kesan. Ez jî di pey wî re dikevim vê salona ku rismê vê xatûna heja a dansker a ji binemaleka mezin û şkestî a yek ji mîrektîyên dawîn ên kurdan liser derîyê wê ye. Rîtma jîyanê û hunerê li sê dîwarên bi neynik ên salonê deng û reng vedide. Êdî dema dansê û muzîkê ye. Belkî azadî bi gaveka tangoyê dest pê dike. Dixwazim piştî dersê, di beşê duyemîn de, em tenê behsa vana bikin.

Nivîskar Tosinê Reşîd:

Fikra kurdistanî bi Barzanî li Sovyetê geş bû

NIVÎSKAR, şair û edîbê kurd Tosinê Reşîd ji heftenameya Basê re axivî. Tosinê Reşid edîb û rewşenbîrê kurdên Ermenistanê ye. Nivîskar, vekoler û kurdnas e. Bi salan di Radyoya Rewanê de kar kiriye û di radyoyê de gelek bername bi rê ve birine, di gelek şanoyên radyoyê de lîstikvanî kiriye.

Gelo em dikarin Tosinê Reşid nas bikin. Tosinê Reşîd, kî ye, li ku hatîye dinyayê, ji kîjan malbatê ye?

Navê bavê min Reşîdê Ozman e. Malbata me ji Sûsiza Qersê, gava ku sala 1918an, tirk dikevin Qersê, bi tevahîya êzdîyên Serhedê ve derbasî Ermenistanê dibin. Li gundê Korbilaxê bi cî dibin. Li vî gundî mirovên me, ên ji eşîra Şerqîya hebûne. Dayika min jî navê wê Xezala Çolo ye. Di sala 1921an de bavê min diçe Tiblîsê, paşê jî malbata xwe dibe wir. Malbat di sala 1933an de vedigere Ermenistanê û li gundê Kurekendê li navçeya Êçmîadzînê bi cih dibe. Ez 22yê Hezîrana 1941an de li zozanên gundê Kûrekendê, ku çîyayê Elegezê bûn, hatime dinê. Dema min dest bi dibistanê kir, li gundê me dibistan heta pola çaran bû. Ji pola 5an heta 7an ez çûme dibistana gundê Haytaxê ku gundekî ermenîyan bû. Sê kîlomêtre ji gundê me dûr bû. Ji pola 8an heta 10an li gundê Samaxarê, ku 5 km ji gundê me dûr bû, bi peyatî diçûm û dihatim. Min dibistan wisa xwand. Min di navbera salên 1959/1964 an de li zankoya Yêrêvanê beşa Perwerdeyê, Fakulteya Fîzîk-Matematîkê qedand. Di sala 1975an de jî doktoraya xwe li ser beşa kîmyayê kir.

Bingeha te ya folklor û kurdnasîyê ji ku dihêt, ev hişmendî çewan çêbû?

Salên zarokatîya min oda me hebû; êvaran gundî û dengbêj lê dicivîyan. Şevên payîz û zivistanan dîwan dikemilîn. Stran, destan, cîrok, efsaneyên liser jîyana êzdîyan digotin. Liser jîyana kurdan dihatin gotin. Ji bilî dengbêjan gundîyên me jî carcaran gelek tiştên bi kurdan ve girêdayî digotin. Dengbêjên wekî Şêx Hesen destan digotin; Mem û Zîn, Sîyabend û Xecê, Ker û Kulik, Xanê Çengzêrîn û gelekên din. Dengbêj Ahmedê Mîrazî ku di nav xelkê de wekî Ahmedê Şewêş dihate nas kirin jî stranên mêranîyê digotin. Ev yek li jîyana min gelek bi tesîr e. Ev bingeh ji zarokatîyê tê.

Mamoste hişmendîya kurdî, kurdistanî û welatperwerîyê çewan dest pêkir. Ji ku, ji çi tesîr çêbû?

Şansê min yê yekem ku ez birazîyê Qanatê Kurdo me. Qanatê Kurdo di dîroka kurdan de xwedî cihekê bi qedre. Kedeka bê hempa daye kurdnasîyê, kurdewarîyê. Sala 1955an wî ez birim Lenîngradê ji bo ku ez li ba wî bixwînim. Lewre hewaya wir li min nehat ez vegerîyam û min li Ermenistanê xwandin berdewam kir. Qanatê Kurdo sala 1955an çend helbestên seydayê Cegerxwîn ji min re şandin. Cara yekem bi helbestên Cegerxwîn fêrî alfabeya latînî bûm. Sala 1957an wî monografîya xwe, ya rêzimanî ji min re şand. Paşê çiqas gotar û pirtûkên wî çap bibûna, ji min re dişand. Pirtûkxaneya apê Qanatê Kurdo ji min re bû wekî dibistanekê.

Dema me şoreşa başûrê Kurdistanê û nemir Mele Mistefa Barzanî nas kir û bi taybetî dema ku Yekîtîya Sovîyêt bi awayê eşkere alîkarî da şoreşê, ew hestên me yên kurdî, kurdistanî kurdperwerî, welat û niştimanperwerî wekî alava agir geş bûn. Me di sala 1963an de komelaya kurdî ava kir. Li wir ziman, çande, folklor û welatperwerîya kurd her li pêş bû. Me di kuçeyan de sirûda Ey Reqîb distira.

Cihê Radyoya Rewanê di dîroka Kurdistanê de pir girîng e. Çîroka te û radyoya Rewanê çi ye?

Radyoya Rewanê berê rojê nîv saet weşana kurdî dikir. Bi têkilîyên nemir Mele Mistefa weşan kirin rojê saet û nîvek. Min 10 salan li radyoyê bernameyek bi navê ansîklopedîya kurdî çêkir. Liser dîrok û serhiladanên kurdan, ser çand, huner, folklor, wêje, erdnîgarî û tiştên bi kurdan re eleqe hemû tişt. Li radyoyê şano amade dikirin, şanoyên radyoyê. Şano bêhtir ser bingehê destanên kurdî çêdikirin. Min jî di wan şanoyan de dilîst. Mînak ez di şanoya Kerr û Kulik de roleka sereke, rola Kerr dilîzim.

Min ji bo Şanoya kurdî ya bajarê Tiblîsê pîêsa Sîyabend û Xecê nivîsîye. Di jîyana min de cihê radyoyê jî pir giring e.

Gelo maceraya nivîsîna te kengê dest pêkir?

Kekê min Rizalîyê Reşîd jî şairekê hêja û xwedî qelemek baş e. Bi gotina ku ew dibêje di sala 1955an de min helbestên xwe ji wî re xwandine. Yekemîn gotara min e kurdî sala 1961an di rojnameya Rêya teze de hatîye weşandin. Yekemîn şiîra min sala 1962an bi radîyoya kurdî, ya Rewanê hatîye belav kirin. Min di sala 1966an de pirtûka xwe ya yekem amade kiribû. Lewre şaxa nivîskarên kurd yên Yêrîvanê nivîsên min nepejirandin, ji min re gotin hin guherînan bike û pesnê sosyalîzmê û Partîya Komûnîst bide. Min ev yek qebûl nekir. Jiber vê yekê jî weşana pirtûka min ya yekem di sala 1975 an de temam dibe. Lê min ti guhertin nekirine pirtûkê, piştî 9 salan, bêyî guherînan, wekî roja ewil da weşandin. Bi navê Kilamên Rê di sala 1975an de pirtûk hate weşandin.

Apê Tosin, tu pêşeroja huner û hunermedan, wêje û wêjevanan, bi tevahî qedera kurdan ya pêşerojê çewan dibînî. Pêşnîyaza cenabê te ji bo wan çîye?

Pêşeroja kurdan ronîye, em ji tarîtîyê ber bi ronahîyê ve diçin. Kurd di gelek roj û zahmetîyan de derbas bûne, êşên nedîtî, nebînayî kişandine. Bi dehan caran di komkujîyan de derbas bûne. Hê jî rojên zor û zahmet li pêşîya kurdan e, lewre rojên xweş û geş jî li pêşîya wan in. Kurdistan dê ava bibe. Ew dayik dê azad bibe. Hêvîya min bi keç û xortên kurdan heye. Lewre xwazî sîyaseta kurdan jî yekîtîyek di nava xwe de ava bikira. Daxwazîya min ji hemû sîyasetmedar, partî, sazî û dezgeyên kurdan heye. Bila berjewendîyên neteweyê kurd li pêşîya hemû tiştî bigirin. Hunermend, wêjenas û nivîskarên kurd jî, bila kurdî bikin taca serê xwe. Bila xizmeta wan ji bo neteweyê kurd be. Bila dilê wan ji bo kurd û Kurdistanê lê bide. Bila keç û xortên kurd jî bixwînin her bixwînin. Bila di hişmedîya wan de netewe, ax û dîroka Kurdistanê şax bide. ji Bakur, ji Başûr, ji Rojhilat, Rojava û sovyetîstana kevn, çavê hemû keç û xortên kurdan maç dikim.

Tosinê Reşîd

Kurdistan dê ava bibe. Ew dayik dê azad bibe. Hêvîya min bi keç û xortên kurdan heye. Lewre xwazî sîyaseta kurdan jî yekîtîyek di nava xwe de ava bikira. Daxwazîya min ji hemû sîyasetmedar, partî, sazî û dezgehên kurdan heye, ku berjewendîyên neteweyê kurd li pêşîya hemû tiştî bigirin.

BERHEMÊN TOSINÊ REŞÎD

Te gelek tişt nivîsîne, gelek werger kirine. Ew berhem dihêne bîra te?

Kêm zêde tiştên ku dihêne bîra min ev in;
Kilamên rê (helbest) 1975, Yêrêvan. wergera tirkî (werger A. Balî) sala 1985 an li Bêrlînê çap bû.
Zozan (helbest) (almanaxa Bahara Teze 3) Sovêtakan grox 1984, Yêrêvan.
Nîvro (helbest) Sovêtakan grox 1987 Yêrêvan
Sîyabend û Xecê (drama) "Roja Nû" Stockholm, 1988,
Şeva bê xew (kurteçîrok) "APEK", Stockholm, 2000,
90-salîya bûyîna zimanzanê mezin Qanatê Kurdo (lêkolîn, bîranîn) bi Husên Hebeş ve, "Hogir" Bonn, 2000.
Êzdîyatî, oleke hê jî nenaskirî, (lêkolîn) "Roja Nû" Stockholm, 2004,
Çapa duyemîn, "Lîs", Dîyarbekir 2010.
Çapa sêyem, weşanxana wezareta karên olî, Hewlêr, 2012. Bi tîpên erebî.
Min bêrîya şevên Spî kirîye (kurteçîrok) "Avesta" Stenbol, 2005.
Min bêrîya şevên Spî kirîye (kurteçîrok) Çapa duyem "Spîrêz" Duhok, 2005. Bi tîpên erebî.
Mestûre, serê hêjayî tac bû (roman), "Araz" Hewlêr, 2005. Bi tîpên erebî.
Sala 2005 an ji bo romana "Mestûre, serê hêjayî tac bû" hêjayî xelata weşanxana "Aras" bûme. Xelat serokwezîrê Herêma Kurdistanê, Nêçîrvan Barzanî daye.
Çapa duyemin, "Ronahî" Amed, 2010.
100 salîya zana û nivîskarê kurd Qanatê Kurdo (lêkolîn û bîranîn), bi Husên Hebeş ve, Yekîtîya Nivîsarên Kurd Duhok, 2009. Bi tîpên erebî.
Evîna te ez parasim (roman) Han Bêrlîn 2010
Em bi zimanê xwe kurd in (berevoka gotarên ser ziman û wêje), 2011 Do Stenbol.
Hêsir (kurteçîrok), "Han" Bêrlîn 2011.
Hêsir (kurteçîrok), Çapa duyem, "Aras" Hewlêr. Bi tîpên erebî. 2012.
Berhemên ji bo çapê amade kirî û çap kirî:
Gulbijêr ji helbestên Şikoyê Hesen, (helbest) "Spîrêz" Duhok, 2007. Bi tîpên erebî.
Şikoyê Hesen, Ba û payîz (helbest) "Avesta" Stenbol, 2008
Folklora Kurmanca (Hecîyê Cindî, Emînê Evdal), Avesta" Stenbol, 2008.
Rizalîyê Reşîd, Baharê bahar nedît, kurteçîrok, "Xoybûn" Bêrlîn, 2008.

Werger

L.N. Tolstoy Çîrokên zarokan Ronahî 2010, Amed
Qanatê Kurdo "Lêgerîna zaza" Hogir 2016 Bon.
Ji bilî van berheman gelek nivîs û gotarên min di rojnameyên wekî Rêya Teze û gelek kovaran de hatine weşandin.